Ezîzê Gerdenzerî



CANGÎR AXA

DRAMA DÎROKÎ

EZÎZÊ GERDENZERÎ

CANGÎR AXA

DRAMA DÎROKÎ

Yêrêvan
Spica
2019

Ezîzê Gerdenzerî
Cangîr Axa
Drama dîrokî
Weşanxana Spica, Yêrêvan, 2019

ՀՏԴ 821.222.5-2 Գարդանզարի
ԳՄԴ84(5Հ=Քրդ)-6
Գ 348

Գարդանզարի Ազիզե
Գ 348 Ջանգիր Աղա Պատմական դրամա/ Ազիզե Գարդանզարի.- Եր.: "Սպիկա" հրատարակչություն, 2019.- 120 էջ:

ՀՏԴ 821.222.5-2 Գարդանզարի
ԳՄԴ 84(5Հ=Քրդ)-6

ISBN 978-9939-854-53-3

© Սպիկա, 2019

Mafê xwedîheq bûna nivîskarê vê berhemê, bi destûrnameya çapkirin û belavkirina pirtûkan tê parastinê, heqê tu kesî tune, ku bê destûra xwedîyê pirtûkê, cardin çap bike û belav bike.

Şanonameya "Cangîr Axa" sala 1988an li Ermenistanê, bajarê Yêrêvanê hatiye nivîsar. Sala 1989an, weşanxana Wezîreta Çandê ya Ermenistanê, ev şanoname, bi tîpên rûsî - kirilî, bi navê "Zarîna Çîya" çap dike. Sala 1990î Têatra Tbîlîsê ya milet, derhênar Mirazê Ûzo Caferov, wê dike şano û bi navê "Cangîr Axa" pêşkeşî temaşevanan dike. Sala 1991ê Înstîtûta Kurdî ya Parîsê ew şano, bi navê "Zarîna Çîya", wek fîlm derbazî li ser kasêta vîdêoyê dike. Cara duem, sala 1998an, Têatra Tbîlîsê ya Kurdî, ev şano pêşkeşî temaşevanan dike. Cara yekem e, ku ev şanoname bi tîpên latînî û ji aliyê xwediyê şanonamê da cardin bala xwe dayînê û hinek guhastin çêkirin, tê weşandinê. Wisa jî li vê kitêbê da têne çapkirin, derheqa Têatra Tbîlîsê ya milet, derbarê vê şanoyê da û beyta mêrxasiyê ya derheqa Cangîr Axa da. Nivîskar spasiya xwe ji rêvebiriya û xebatkarên weşanxana Spica ra îlan dike.

Kitêbên nivîskar

• Kilîta dil (helbest). Weşanxana Sovetakan Groch, Yerevan-1983. Ev pirtûk bi biryara Yekîtiya Nivîskarên Ermenistanê gerekî sala 1968'î bihata çapkirin.

• Zarîna çiya (şanoname). Weşanxana Wezîreta Çandê, Yerevan – 1989

• Fîncana ferfurî (roman). Tîpên Kîrîlî. Weşanxana Sovetakan Groch, Yerevan – 1990

• Gêlavêj (kitêb, berevok). Tîpên Kîrîlî.. Weşanxana Parujr Sevak, Yerevan – 1996.

• Hezkirina qedexe (kitêb, berevok). Tîpên Latînî. Weşanxana Doz, Istanbul - 2012.

• H. C. Andersen, Çîrok û Serpêhatî (kitêb). Tîpên Latînî. Wergêr ji danîmarkî: Ezîzê Gerdenzerî. Weşanxana Doz , Istanbul - 2012.

• Fîncana Ferfûrî (roman). Tîpên Latînî. Weşanxana Lis, Diyarbekir – 2015.

• Ludvig Holberg, Jeppeyê li Serê Çîyê (şanoname). Tîpên Latînî. Wergêr ji danîmarkî: Ezîzê Gerdenzerî. Weşanxana Lîs, Diyarbekir - 2017.

• Çîyayê Şengalê (romana dîrokî). Tîpên Latînî. Yêrêvan, Spica - 2018.

• Sûrên û Bîco (novêl û serpêhatî). Tîpên Latînî. Yêrêvan, Spica - 2018.

• Bingeh (roman). Tîpên Latînî. Yêrêvan, Spica - 2018.

• Kaare Bluitgen, Karen Jeppe. Ronahî li nav tariya sawkêş da - tevgera miletekî. Wergêr ji danîmarî bi zimanê ermenî: Ezîzê Gerdenzerî. Weşanxana "VAN ARYAN", Yerevan, 2018 (Կարեն Եփփե, Լույս չարագուշակ խավարում – Մի ժողովրդի պայքար: Հեղինակ՝ Կաարե Բլուտգեն: Թարգմանիչ՝ Ազիզե Գարդանզարի (Ճալիկո Ամիրյան):

• H. C. Andersen, Periya avê û çend çîrokên din (pirtûk). Tîpên Latînî. Yêrêvan, Weşanxana Van Aryan, 2018.

• Şengala Birîndar (Helbest). Weşanxana Spica, Yêrêvan, 2019

Prolog

Drama dîrokî "Cangîr Axa" sala 1988an hate nivîsar; dema destpêka hilweşîna Yekîtiya Sovyêt de. Gava ku min ji bavê xwe re ev şanoname xwend, hêsir li çavên wî barîn, ew giriya û got: "Erê, lawo, me, êzîdiyan, du bav ji cîhkî çal nekiriye". Şano di derbarê wê yekê de ne, ku bi çi awayî êzîdiyên bakûrê welêt, di sala 1918an de, bi mecbûrî dev ji bingeha kalûbavên xwe berdidin. Koçberiya wan, zulm û zehmetiya wan li ser riya koçberiyê dîtî, ewqasî bi êş û azar bûye, ku qey bêjî çiyayên welêt jî li pey lawên xwe dizarin, digirîn. Lehengên çîyan pişta xwe didin çiyayên xwe, welatê xwe û berê xwe didin xerîbiyê, berê xwe didin Welatê Ûris. Welatê Ûris paşê dibe Yekîtiya Sovyêt. Di Yekîtiya Sovyêt de, heta salên 1937 - 38an, rewşa êzîdiyên peneber pir xweş bûye. Tu êzîdîkî bê mal û bê milk namîne. Miletê ermenî û desthilatdariya Komara Ermenistanê, destê biratiyê dirêjî êzîdiyan dikin. Hemû dergeh, dergehên xwendin û zanebûne, dergehên kar û xebatê, dergehên çand, huner, sportê û hwd, li ber civaka êzîdî fireh vedibin. Milet çavên xwe vedike û qey bêjî êş û azara li destê dagirkerên axa xwe da dîtibûn, bere bere bîra dikin. Lê mixabin, salên 1937 - 38an, li seranserî Yekîtiya Sovyêt da, terora Stalînîzmê dest pê dibe. Mêrxasên me yên li şanoyê da behsa wan tê kirin, ewan tên girtin, dikevin heps û zindanan. Di heps û zindanên Yekîtiya Sovyêt da, zulm û zordariya mêrxasên me li ber çavên xwe dibînin, hîn jî ji zulm û zordariya wan li welêt da dîtibû girantir û bi şewattir bûye... Tiştê here giran û here xeter ew bû, ku êzîdî wek çenge garis li nav Yekîtiya Sovyêt da belav dibin. Riya helandinê, riya asîmîle bûnê,

riya tunebûnê dikeve pêşiya beşek ji beşên civaka êzîdî. Êzîdiyên welêt da mabûn bê pişt dimînin û ewan destê zorê dibin misilman. Ev tişt ji bo mêrxsên me ji mirinê jî xerabtir bû. Qey bêjî mêrxsên me remildar bûn û tê derdixistin, ku wê weletê wan û miletê wan, yên bê pişt mayî dîsa û pir caran wê bibin hedefa dijmin, hedefa îslamîstên tûndrew, hedefa çete û terorîstan û civaka êzîdî li ber diriyana manê û nemanê wê bisekine. Belê, komkujiya êzîdiyan ya 03.08.2014an, baltekî giran bû, ku li nav çav û gavên êzîdxanê ket. Êdî pênc sal piştî wê komkujiya malwêran ra derbas bûye. Lê mixabin, hîn jî 350 - 400.000 êzîdî li bin çadirên nêîlon da dijîn, bi dest sir û sermê, bi dest tîbûn û birçîbûnê dimirin. Dijmin û xêrnexwaz gerekî bizanbin; êzîdî hebûne, hene û wê hebin.

EZDIKI.COM

Cangîr Axa -
Mêrxasê Berxwedana Êzdîxanê

Cangîr Axa, tê naskirin wek mêrxas; mêrxasê êzdîxanê, mêrxasekî tevgera azadîxwazan, tevgera destpêka sedsala 20-an li Împêratoriya Osmaniyan da. Ew ji bo parastina axa kal û bavan, ji bo parastina mafê cimeta êzîdî û ne tenê êzîdî, ala serhildanê bilind kiriye û pêşberî dagirkrên axa me, pêşberî desthilatdarên Împeratoriya Osmaniyan yên nû, pêşberî "tirkên gênc" şer kiriye. Serhildana wê demê, destpêka salên 1900î, ew li tev 350 şêr û egîtên nolî xwe, li Devera Wanê da, îlan dike. Paşê hejmara siwarên li rex wî hezar pênsedî zêdetir dibe. Hingê di welatê kal û bavan da û li bin desthilatdariya osmaniyan da, 700 hezarî zêdetir êzîdî dijîtin.

Cangîr Axa sala 1874an li gundê Çibûxlyê, qeza Bêrgiriyê, Devera Wanê tê dinê. Bavê wî Xetîv axayê Mendikî, axayê êla Ziqurîya bûye. Ew însanekî dilovan, dûrşer, pir rehm û pir dewletî bûye. Ew bavê şeş kuran bûye. Li nav wan şeş biran da, yê herî jîr, jêhatî, wêrek, wisa jî şûrkêş, mêşindar, çeleng, ew Cangîr Axa bûye. Lema jî Xetiv Axa, beriya mirinê, zêrên xwe, mal û milkên xwe, teslîmî Cangîr Axa dike. Wî zanibû, ku hatina "tirkên gênc" li ser text li Împêratoriya Osmaniyan da, wê tu dergekî xêrê li ber êzîdiyan neyê vekirin. Ewan jî wê nolî kal û bavên xwe, beriya her tiştî, wê fermana komkujiya êzîdiyan, wisa jî ol û miletên kêmhejmar yên din, wê îlan bikin. Lema jî wî aqlimendî temî da lawê xwe, ku tivdarek bê kirin, ji bo berxwedanê û parastina bingeha kal û bavan, parastina milet.

Piştî mirina bavê, Cangîr Axayê 30-32 salî, pê zêra çekên rûsiyê û hespên erebistanê dikire. Ew demeke kurt da 350 - 400 şêr û

egîtên eşîra xwe li dor xwe dicivîne. Ew diçe hewar û gaziya esîrên êzîdiyan yên din, talanê wan vedigerîne, mêrên bê sûc û bê guneh ketibûn hebs û zindanan, ji wir dertîne. Nav û dengê wî zûtirekê li nav êzdîxana Devera Wanê belav dibe. Pir mêrxasên eşîrên din jî tên û digihîjin wî. Ew dîsa pir çek û hesp dikire. Ew peywendî li tev mezinên eşîrên cînar yên misilman, li tev serokên rêxistinên ermeniyan, aşûriyan, kildanan û yûnanan datîne.

Sala 1904an Cangîr Axa û Andranîk paşa rastî hevdu tên. Wê demê Cangîr Axa dergîstî bû. Mêrxasê ermenî dibe serdawetiyê mêrxasê êzîdiyan. Dostanî û biratiya herdu mêrxasan ji hingê va destpêdibe.

Dawiya sala 1908an Cangîr axa li tev mezinên êzîdiyên ûrisêtê Ûsiv Begê Hesen Axa, li tev lawê Mala Mîrên Êzîdiyan, Mîrê ciwan û çeleng, Mîr Îsmaîl Begê û li tev dostê êzîdiyan, kompozîtorê ermeniyan yê navdar, Komîtasê nemirî, ewan li dêra Êcmiazinê da, li tev cîgirê Xrîmean Hayrîk ê ziyaretî, arxêpîskopos Gêvorg Sûrenyans, rûdinên. Piştî wê rasthatinê, rûpelekî nû li dîrokan êzîdiyan û ermeniyan da tê nivîsar; dostanî û cînartiya hezaran salan ya qenc, dibe biratî û hevkarî. Mîr Îsmaîl Begê, Ûsiv Begê Hesen Axa û Cangîr Axa, wisa jî kar û xebateke pir mezin dikin, ji bo xweşkirina peywendiyên li tev desthilatdarên Împêratorê Rûsiyê û li tev fermandariya leşkerên rûs. Mîr Îsmaîl Begê, rastî şûndarê împêratorê rûsan li Kavkazê, Varansov - Daşkov tê. Birayê Cangîr Axa, Reşîd Axa, derbasî li ser qulixê dibe di leşkerîkêşiya ûris da. Leşkerê ûris bi piştgiriya siwarên Cangîr Axa, Ûsiv Begê, Andranîk Paşa li pêşeniya Kavkazê da serdikevin, pir gund û bajarên ermeniyan, êzîdiyan, aşûriyan ji bin nîrê osmaniyan derdikevin. Demeke ne dirêj xelkên wan gund û bajaran jîyaneke aram derbas dikin. Lê feleka xayîn vê carê jî berê xwe ji êzîdiyan û ermeniyan diguhêze. Sala 1917an şoreşa karker û gundiyan, Împêratoroia Rûsiyê da serdikeve. Leşkerê rûs paşda dizvire û berê xwe didin welatê xwe. Pişta êzîdiyan û ermeniyan vala dibe. Meydan osmaniyan û Allayên Hemîdiyan ra fireh dibe. Dîsa şerê manê û nemanê dest pê dibe. Osmanî bi du milan va êrîşê dibin li ser Ermenistanê û dixwazin bikevin Yêrêvanê. Li navbera mêrxasên

ermeniyan û eskerên osmaniyan, li Serderebadê û Baş - Aparanê da şerê manê û nemanê destpêdibe. Herdu pêşeniyan da jî, Cargîr Axa li tev egît û mêrxasên li rex wî, pişt dikutin pişta mêrxasên ermeniyan û berên xwe didin dijminên devxwîn. Herdu pêşeniyan da jî dijmin dişkê, eskerên dijmin nolî rûvî û çeqelan bazdidin, direvin.

Cargîr Axa li tev mêrxasên xwe, li Komara Ermenistanê da, pêşiyê li nehiya Aparanê, gundê me da, Cercerîsrê da, cîhûwar dibin, paşê ewan derbasî gundên din dibin. Çend sal piştî serketina şoreşa karker û gundiyan, Welatê Ûris dibe Yekîtiya Soviyêt û Komara Ermenistanê jî dibe endamekî Yekîtiya Soviyêt. Hema destpêkê da, di Komara Ermenistanê da, li ber êzîdiyan dergê xêrê, dergê firêqetiyê, dergê xwendinê û zanebûnê, dergê jîyaneke aram û bextewar vedibe. Di demeke kin da du kongirên êzîdiyan tên derbaskirin. Hemû daxwazên êzîdiyan, ji aliyê serok û rêberên Komara Ermenistanê da, bi kêfxweşîke mezin tên qebûl kirin. Her gundekî êzîdiyan da mekteb tên vekirin. Li wan mekteban da, zarokên êzîdiyan hînî xwendin û nivîsara bi zimanê zikmakî dibin. Kitêbên bo zarokên êzîdiyan, pêşiyê tên nivîsandin bi tîpên ermenî, lê salên 30î bi tîpên latînî. Her gundîkî êzîdî dibe xwedî ax, mal û milk. Her gundekî êzîdiyan da dezgehên çandê, hunerê, sportê tên avakirin. Pir tiştên qenc wê demê ji bo êzîdiyan tê kirin. Lê mixabin, dawiya salên sîyî têrora bi navê stalînîzmê li Yekîtiya siviyêt da destpêdibe. Pir însanên li nav êzîdiyan da bi navûdeng, li nav wan da mêrxasê me, Cangîr Axa û yên doranê wî, têne girtin û berê wan didin Sîmbîra sike sar, bê serûbin. Sala 1943an mêrxasê me li wir wefat dibe.

Desthilatdarên Ermenistanê, wisa jî miletê ermenî, ked û xebata Cangîr Axa bilind qîmet kirine û niha jî qîmet dikin. Niha pir heykel û peykerên wî xweşmêrî, bi destê hostayên bi navûdeng hatine terişandin, gund û bajarên Ermenistanê da, li ser pir kûçe, kolanan, rêgehan û meydanan hatine danîn. Civaka êzîdiyan ya Ermenistanê û ne tenê Ermenistanê, qedir û rûmeta wî xweşmêrî pir zanin. Li ser textê şînê yan şahiyê, tim salixiya Mala Maqûl û serokê wê malbetê yê nemirî, Cangîr Axa tê vexwarin.

Van paşwextiyan, karsaz û nivîskar Mîrzê Çolo Siloyan, di

Rêgeha Mêrxasan de, kîjan li hewşa herdu ziyaretên êzîdiyan yên li Ermenistanê da, heykelê Cangîr Axa jî li rex heykelê mêrxasên din cîhûwar kiriye.

Derheqa mêrxasiya Cargîr Axa da nivîskaran pir goter û serhatî nivîsîne. Pir hunermendan û dengbêjan kulam û stran nivîsîne û anîne li ser zar. Pir lêgênd derheqa mêrxasiya Cargîr Axa da heta niha jî têne qisekirin.

Ev şanoname pêşkêşeke biçûk e, ji aliyê xwediyê vê berhemê da, ji bo bîranîna Cangîr Axa û mêrxasên li rex wî.

Belê, tenê li goveka şanonameyekê da nikare cîhûwar be, mêrxasiya wî xweşmêrî, dilovanî û dilrehmiya wî maqûlî, aqilmendiya wî şoreşgerî. Lema jî beyta nivîskarê vê berhemê jî ya bi navê "Gundê Me" li vê kitêbê da hatiye cîûwar kirin.

Ezîzê Gerdenzerî

Cangîr Axa - Zarîna Çîya
(Şano ya çar perde/qewmandin)

Şexsiyetên sereke

Rostemê Xalitî, gundî, 49-50 salî
Perîşan – jina Rostem, 45-46 salî
Nebî – lawê Rostem, 16-17 salî
Varazdat – lawê dostê Rostem yê ermenî, 16-17 salî
Cangîr axa, 44-45 salî
Şêx Edo, 49-50 salî
Reşîd – dengbêj, 40-45 salî
Evdilmecîd beg, 45-50 salî
Cewar beg, 45-50 salî
Du eskerên tirk, du çêkîstên mêr(xizmetkarên asayîşa Yekîtiya Sovyêtê) û du çêkîstên jin.

Qewmandin/perda yekê û duda li welêt da, salên 1915-1918an. Qewmandina sisiyan û çaran li Yekîtya Sovyêt da, salên 1937- 1938an.

Qewmandin(perde)a yekê

Dîmen(sehne) a yekê

Rostem û Perîşan

Li ser perdê şikilên Cangîr axa û Andranîk paşa. Li pişt perdê dengê meyê û kulama derheqa Cangîr axa de tê:

Lo lo lo lo lo lo bavo,
Lo bavo şere, xweyo şere, şer girane,
Cangîr axa kela mêrane,
Dîsa mêrê hewar û gazyane.
De lêxe kekê Fetla, de tu lêxe,
Eskerê Roma reş girane,
De berdê ji kela Wanê derxe.
Lo lo lo lo lo lo bavo,
Lo bavo şerekê qewimîye Tewrêzê,
Di devê vê Delîmanê, biniya rê da,
De Xweyo qanekê me qewimiye
Tewrêzê - Delîmanê binya rê da
Andiranîk paşa xweşmêrane aza
Qayşa maûzerê tev girêda,
Go: "Ezê di bextê we da me,
Hûnê rabin,cabekê bidine Cangîr axa,
Bêjinê emê di bextê tedane,

Tu di bextê Xwedê da,
De rabe, nesekine, were,
Hêsîrê me mane kela Wanê
Bin berfê da."
De lêxe kekê Fetla, de tu lêxe,
Eskerê Roma reş girane,
De berdê ji kela Wanê derxe.
Lo lo lo lo lo bavo,
Lo bavo, dibê Fêrîk paşa hate Wanê,
Têlekê da bo Mûşê, Erzîcnê, Erzinganê
Digo: "Mişîro, bextê te û Xwedê me,
De rabe çend topekan bişîne Wanê,
De dibê hezar çarsid mêrê ce'nfîda derketye Rewanê,
De tu werê lêxe biqelîne koka me temamyanê".
De lêxê kekê Fetla, de tu lêxe,
Eskerê Roma reş girane,
De berdê ji kela Wanê derxe.
Lo lo lo lo lo bavo,
Lo bavo ere, lo xweyo şere şer girane,
Şer girane, Cangîr axa kela mêrane,
Dîsa mêrê hewar û gazyane,
De lêxe kekê Fetla, de tu lêxe,
Eskerê Roma reş girane,
De berdê ji kela Wanê derxe....
Ha hî hî hî...

Perde hêdî hêdî vedibe. Li ser dikê(sehnê): pêşber avahiyê dîwarê wê kevirî. Li ber derê avahî; dara gûzê, çend kevirên reş û mezin. Piştavahî şikilê çîyan.

ROSTEM – (Li ber derê avahî, li ser kevirekî rûniştî, tizbî li destê wî da).

Xêr, şer, Xwedê. Xêr şer, Xwedê. Xêr, şer. Dîsa li ser şer xelas bû. (Qirçe-qirça gulan tê). Simila! Xwedêyo, ev çi şipûke? Ev çi ecêbe? Gule û barûtan vê ewlê baharê xelqê hêsîr xêre? Xwedêyo, tu bidî xatirê nave xwe! Şemso, tu bêy hewara hevtê û du miletî, paşê bêy hewara me!

PERÎŞAN – (Ji mal dertê).

Filankeş, ocax li te kor be, malik li te kavil be, dûrî heçê heyî, rabe! Tu çi di cî da bûyî kevir?

ROSTEM – Evda Xwedê, te ji min xêr e! Ez çi bikim? Dest diçe li ber destê Xwedayê min? Heger roja me jî hatibe, em ê jî bên kuştin. Tenê heyfa min ji wê heyfê ye, ku em nizanin, kuştina me wê bi destê kê be.

PERÎŞAN – Cehnima min û te, her hevt êtîmên me li çolê ne! Xwedê bide xatirê navê xwe! Dilê min rebenê şahidetî dide, wê şuxuleke neqenc biqewime. De tu biçûyayî, te serîk zarokên me bixista!

ROSTEM – Lawên me bê tedbîr û tivdarek li mal derneketine. Ez jî mala xwe bêxweyî û bêxwedan nahêlim! Ew şîret bavê min li min nekiriye! Heger kuştin û girtineke min hebe, bila li ber derê min be. Hebe tunebe çend qaçax ji çîyê derketine.

PERÎŞAN – Qaçaxên çi? De tu bala xwe bidê, ma li der û dor çi diqewime?

ROSTEM – (Ji cî radibe).

Erê welleh tu rast î. Min çiqas tizbî diavêt li ser şer xelas dibû. Gundê ermeniyan agir pê ketye. Gelo halê dostê min, Mûşêx û malbeta wî, çawa bû. Lawik li mal da bûna, em biçûna hewar û gaziya wan.

PERÎŞAN – Eskerê ûris ji vir derketiye, ji Rom a Reş ra meydan fîreh bûye. Devxwîn bûne, Xelqên bê sûc û bê guneh dikujin. Wê gundê me jî kavil bikin. Wê me jî kokbirî bikin. Tu yî gunehkar! Welleh tê bibî sebebê me. Min ji te ra digot, ku em koça xwe ji vir barkin. Em berê xwe bidin şexs û ziyaretên xwe. Berê xwe bidin Geliyê Lalişê. Berê xwe bidin Çiyayê Şengalê.

ROSTEM – Evda Xwedê, hemû çawa, em jî wisa.

PERÎŞAN –Çîma, hindik xelkên ji vî gundî, koçkirine û çûne?

ROSTEM – Tu bêhna xwe firehke. Ewan xwe nadine li ser me.

PERÎŞAN – Kê ji te ra got? Rome! Rom a Reşe! Heçê ne ji wan e ji kokê va wan dibire.

ROSTEM – Eşîrên me yên bûne misilman, serê xwe danenîne ax û berên sar. Eşîr bavê eşîrê ye. Ewan wê bêne hewar û gaziya me!

PERÎŞAN – De tu li ser wî guhî razê! Em ê jî bala xwe bidinê, ka axiriya te wê bibe çi?

ROSTEM – Xîret, namûs avîtine li ber se, sa jî qebûl nekiriye.

PERÎŞAN – Meriv, însanên wisa hene, ku ewan ji se û kûçikan jî xerabtir in, lo!

ROSTEM – Na - nebû! Ev ax, axa me ye! Ev war, warê kal û bavên me ye! Em axa xwe bi destê xelkê va bernadin. Tu eyneliya min bîne!

PERÎŞAN – Xwezî lawên me li mal da bûna. Min îşev xewneke xerab dîtiye.

ROSTEM – Ne min ji te ra got, tivingê bîne.

PERÎŞAN – Evdê Xwedê, merî kulmê naçe dirêşê.

Perîşan diçe.

EZDIKI.COM

Dîmen a dudan

Rostem bi tenê, paşê Varazdat

ROSTEM – Ew in dirêş, erê? De bila ewan êrîşê bibin li ser me. Em ê bala xwe bidinê, kê ye ji me dirêş? Em li ber Xwedayê xwe da helalin. Me ciyê belasebeb kişî mirîşka tu kesî nekirye. Rebê Alemê wê bê hewara me. Xwedayê Mezin wê avê li ser vî agirî da jî bike. Şems wê vê qal û cengê jî betal bike.

VARAZDAT – (*Pêxas û serqot, hikehilk pê ketî, li ser milê rastê ra derda tê*).

Apo, apo, min veşêre. Apo min xelaske. Apo ewan daye dû min. Ewan wê min jî bikujin.

ROSTEM – Varazdat, lawo, kî ne ewan? Kê daye dû te? Lawo çi hewale?

VARAZDAT – Eskerê romiyan pê pê li pey min tên. Ewan bavê min kuştin, Nanê kuştin, Narê kuştin, Gêvo û Arşo kuştin, agir berî mala me dan. Ewan gundê me kavil kirin. Ewan dixwazin min jî bikujin.

ROSTEM – (*Varazdat hembêz dike*).

Lawo netirse! Heta ez û lawên min saxin û li rûbarê dinê ne, em nahêlin mûk li ser serê te şaş be. Xwedê ya heq nede ya neheq, lawo! Xwedê wan neheqan piştosanî bavêje. Gunehê dostê min, malbetê û xelkê gund, li stukura wan zulmkar û sextekaran be, lawo!

Dîmen a sisiya

Ewan, Nebî û Perîşan

NEBÎ – (Tiving li ser milê wî , mer li dêst da, li ser milê çepê ra derda tê).

Varazdat can, kê bêxatriya te kirye? Ez kêxim?

ROSTEM – Tê kêxî? De zû lawik bibe û kuncekî gomê da veşêre! Paşê were û li pişt derî bisekine! Heta ez nebêjim, tu dengê gulê dernexî! Te bihîs!? De bilivin!

Nebî û Varazdat diçin.

ROSTEM – (*pey wan dike gazî*).

Lawk tirsiya ye, avê bidinê.

PERÎŞAN – (*Li ber derî ew herdu gêncan dibîne. Ew ji Varazdat ra dibêje*).

Lawo, Xwedê stukura wan neheqan bişkêne. Weyê, weyê, wê halê me û zarokên me çawa be?

ROSTEM – Neke lubelûb! Tivingê virdake! (Ew tivingê li destê jinê digire û li tev çeka xwe xeber dide). Min ad û qerar kiribû, ku te negirin destê xwe. Tu bi xwe dibînî. Ez mecbûrim dest biavêjin te. Wekî din çê nabe.

PERÎŞAN – Filankes, ewan zehfin, tu pê nikarî. Tu zarê şîrin li wan bigire. Pakî pîrî li tev wan xeberde. Belkî ewan dev ji cegera me berdidin.

ROSTEM – Tu here mal! Ez zanim çi dikim.

PERÎŞAN – Weyê, weyê. halê me wê çawa be?

Perîşan diçe.

Dîmen a çara

Rostem bi tenê, paşê du esker

ROSTEM – (*Ew goşê li ser milê rastê dinihêre*).

Ewana dudune! Ewan xurê du gulên min in. Na! Awa çê nabe. Ez dikarim bibim sebebê kuştina gundiyên xwe. Daha baş dibe ez sebir bikim.

Du esker li ser mile rastê ra derda tên.

ESKERÊ YEKEM – (*Ew çav Rostem dikeve, disekine, bi gef û gur xeber dide*).

Kanê ew lawikê kafir? Şopa wî tê li ber derê te. Tu xwediyê xwe û çend seriyan î? Tu çima kafiran sitar dikî?

ESKERÊ DUEM – (*Pê pê li pey yê yekem tê, vî alî û wî alî çavên xwe digerîne*).

Kanê? Kafir li ku ye? Xwîna kafiran derman e. Ez ê wî bikujim, xwîna wî jî firkim, belkî diçim bihiştê. De zû wî bide destê min!

ROSTEM – (*Destê wî li ser çeqmaqa tivingê, berê çekê hey dide eskerê yekem, hey yê duem*).

Wê zarokê xwe avêtiye li ber bextê min. Em jî eşîrin. Dijmin bûya jî, mafê min tunebû bida destê we.

ESKERÊ YEKEM – Eskerê hikumetê li tev te xeber dide. De zû wê çeqmaqa xwe bide destê min! Here, kafir bîne!

ESKERÊ DUEM – Ez te nakujin. Tu netirse. Hîn jî siriya te ya kuştinê nehatiye. Wî kafirî bide min.

ROSTEM – (*Ew pişta xwe dide derî û berê lûla tivingê dide eskerê duem*).

Li ku da diçî? Bisekine! Guh bidin li ser min! Xwîna we ketye cave we, ci ye? Qetla xwe li ber derê min dûrxin!

ESKERÊ YEKEM – Tu wî bide destê me, lê em li vir wî nakujin.

ESKERÊ DUEM – Bide! Ji te ra dibêm, kafir bide min.

ROSTEM – Ez nikarim irf û adetên kal û bavan pêpez bikim! Ez nikarim wî gunehî têkime stukura xwe! Begê we kê ye? Paşayê we kê ye? Mezinê we kê ye? Herin û bêjine wî, ew ê ji min fehm bike.

ESKERÊ YEKEM – Hûn kafiran sitar dikin, erê? Hûn piştgiriya dijminên Împêriyê yên hundir dikin,erê? Gelo hûn zanin, ku hûn serê xwe didin li ber serê kê? Tu kafir nedî, em ê bi destê zorê bibin.

ESKERÊ DUEM – Kafir bide! Xwîna wan wek dimis şirîn e.

ROSTEM – Çima hûn naxwazin ji min fehm bikin? Ez nikarim wê yekê bikim. Ez nikarim xwe û hevtê govet bavê xwe, li nava êl û eşîrê da rezîl bikim. Mirin ji vê bazarê çêtir e.

ESKERÊ YEKEM – Netirse. Ez te nakujin. Nêçîra min bide.

ESKERÊ DUEM – Nêçîrê bide.

ROSTEM – Ez natirsim! Gerekî xof û tirsa Xwedê, di dilê însanan da hebe! Cûcik cûcik e, avê vedixwe, dîsa berê xwe dide Xwedê û asîman dinihêre.

ESKERÊ YEKEM – Ji min ra lo lo nexwîne. Zû bike, wî bêxwedêyî bîne li vir.

ESKERÊ DUEM – Zû bide. Diranên min dixwurin.

ROSTEM – Ew kurik li ber ruhstînê xwe revîye. Xwedê rêya mala min nîşanî wî kirye. Xwedê perê xwe daniye li ser wî û aniye vir, teslîmî min kiriye. Ez çawa dikarin xwe li ber Xwedayê xwe da xwe gunehkar bikim?

ESKERÊ YEKEM – Çi ye, dibe ku, tu kuştina xwe dixwazî?

ESKERÊ DUEM – Hela min û vî kurmancî binihêr. Ew bûye bav û birayê fila. De zû wî bide destê me.

ROSTEM – Heta ez û her hevt lawên min saxin û li rûbarê dinê ne, ew yek nebûye û tucar nabe!

ESKERÊ YEKEM – Binihêr, hevt kurê wî hene. Ew tirsê ji me difirîne. Ne ku hevt, lê hevsid kurê te jî hebin, li ser me nikarin. De tu bala xwe bidê, me çi aniye li serê ermeniyan? Em ê we jî têkin roja wan. Tu vê saetê, vê deqê, li ber derî dûr neketî, ci ye, ez zanim çi dikim. De zû bilive!

ESKERÊ DUEM – Ez gulê berî bedena wî nedim?

ROSTEM – Ez û lawên min, em tenê nînin. Çavên xwe xweş vekin. Hûn zanin we derê kê girtiye?

ESKERÊ YEKEM – Ev ê han, mêrekî mêrxase, lê çawa? Hemû ji me ditirsin. Ev ê han jî naxwaze kafirekî qurbana me bike.

ESKERÊ DUEM – Nêçîra me bide destê me! Yan na, em ê wî jî, te jî, ji xwe ra têkine qurban!

Dibe ringeringa simê hespan. Dengê heytehola siwaran tê.

ESKERÊ YEKEM – Cangîr Axa hat! De em çûn!

ESKERÊ DUEM – Em diçin. Lê paşê, em ê ev kirên te, ji çavên te ra derînin.

Herdu esker direvin, diçin.

Dîmen a pênca

Rostem bi tenê

ROSTEM – Li ku da? Qasekî jî hûn bisekinyana. Qursax û wêrekiya mêran ji we va tune. Hûn çaxê pir in, wek gurên perane ne, li ser xwe ra tu kesî nabînin. Lê çaxê hûn hindikin, pîrejinek jî ji we çêtir e. Çawa tirsiyan? Navê bavê Bavan saw û sêncê dike dilê wan

DENG LI PIŞT PERDEYÊ – Rostem, Rostemo.

ROSTEM – Erê welleh ev dengê Cangîr axa ye. lo! Ev dengê bavê Bava ye!

Dîmen a şeşan

Ew, Cangîr axa, şêx Edo, Reşîdê dengbêj

ROSTEM – Keremkin! Keremkin gelî maqûlan! Hûn bi xêr û li ser çavên min û hevt govek bavên min ra hatine! Keremkin!

CANGÎR AXA – Rostemo, Xwedê xêrke, eskerên Romê li vir çi dikirin?

ROSTEM – Bavo, çi ji te veşêrim, çi ji Xwedê! Cerda Rom a Reş avêtye li ser gundê ermeniyan. Ciwanek ji wê xeterê xelas bûye. Wî xwe avêtiye li ber bextê min. Du eskerê Romê hatibûn li ber derê min û dixwestin wî ciwanî bikujin. Bavo, heger tu ji me va derneketayî, kê zane halê me wê çawa bûya?

ŞÊX EDO – Rostemo, lawo, çi ye, tu dixwazî destê me û Rom a Reş têkî hevdu?

CANGÎR AXA – Eferîn, Rostemo! Tu vê carê jî gorî nave kal û bavên xwe derketî. (Ew deyl dengbêjê xwe dike). Reşîdo, divê tu pesnê mêrna awa bidî.

REŞÎD – Li ser çavên min, Bavo (Tiliya xwe dike guhê xwe, çend denga dikuxe, paşê dest bi stranê dike).

De lo, lo, lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, lo, lo, lo, lo,
De lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Heylo Bavo,

Fêza me da çiyan e, ha bi çiyan e,
Binpiya me da deşteke dûze bi dûran e,
Wê deştê da gundin, gundên ermenyan e,
Wir xwîn dirije, xwînê avîtye zengiyê manekiyan e.
De lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Tifalek ji zilmê filitîye,
Xwe avêtiye li ber bextê Rostemê Xalitiyan e,
Neyaran derê Rostem girtiye, dibên hane, ne bi hane,
Heger tu wî tifalî nedî, em ê te jî bikujin,
Goştê te têkin xurê teyr û tûyan e.
De lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Rostem ketiye ne lavan e,ne jî dîlekan e,
Berê xwe daye van neyaran, van dijminan e.
Bavê Bava, mêrê oxirmê, ha giran e,
De lo, lo, lo, lo, lo, lo,
Lo, lo, lo, lo, lo, lo, lo.

CANGÎR AXA – Reşîdo, tu ji me ra xweş bî! Rostemo, tu zanî, ku li vê nehiyê da, tim qonaxa min li mala te bûye! Min mêranya te, îro jî li ber çavên xwe dît. Ji bo wê yekê, ez ji Xwedayê xwe pir razîme.

ROSTEM – Tu li tev bêlûka xwe, hûn li ser çavê min, li ser serê min ra hatine, Bavo! Keremkin li serê jorin!

CANGÎR AXA – Rostemo, mala te ava be! Roja îroyin, leşkerê ûrisan ji vê qezayê derketiye, pişta me û pişta ermeniyan vala hîştiye. Eskerê Romê, nolî gurên har berê xwe dane ermeniyan. Ewan keçê nikarin kurtê dikarin. Ûris çûye, ewan jî jîr bûne. Ewan siba yan dusiba, wê berê xwe bidine me û de'wa mêranyê ji me ra jî daynin. Gotina min çi ye? Em gerekî bi xwe, hidûdê xwe û xelkê

xwe biparêzin. Rostemo, di gundê we da, li olka we da, kê ku destê wî li dar digire, gerekî bê û bigihîje min. Te got erê! Lawên bavkotiyan û tirsonek ji me ne lazimin. Gula dijmin ji mêrê wêrek ditirse. Heger mêrê çê tê kuştinê jî, ew beriya kuştine bi hezaran yên der û doranê xwe rizgar dike. Em borcdarin, ew erkê me ye, xwe û xelkê xwe rizgar bikin. Divê em axa xwe bi destê xelkê va bernedin. Vê roja helebelê, divê em milet têkine li bin perên xwe. Ji bo şer divê em amadekariyê bibînin. Rostemo, tê ji me ra çi bêjî?

ROSTEM – Serîk e ew oxir e, Bavo! Ciyê lingên te lê, li wir jî sere me! Gotinên te heq in, ez benî! Heta merî bi xwe, xwe nexûrîne, xura wî naşkê! Belê, divê em tedbîr û tivdarekê şer bikin. Em borcdarin li rex te bisekinin! Wekî din çê nabe!

CANGÎR AXA – Şêx Edo, tê ji me ra çi bêjî?

ŞÊX EDO – Ez çi bêjim, Bavo? Rome, Rom a Reşe, dewlete, sîlihkirîye, top û cebirxanên wî heye! Lê em? Serî binî 30-35 gundên me li vê qezayê da heye! Ewan ku bixwazin, di rojekî da dikarin heqê me bêne der. Îlac û îmkana me tune, Bavo! Em gerekî rêkî ji xwe ra bibînin. Dibêjin: revek heye ji mêraniyê çêtir e! Dostê me ûris e. Ew li ku, em jî li wir. Maqûlo, sere birî nayê kirîn! Em ê li vir, li nav dest û piyan da herin, winda bibin! Xweyî û xudanê me, li vir tu kesek jî tune. Axayo, were bide xatirê navê mala Adiya, xebera şêxê xwe bike. Divê em êlê li vê xezebê xelas bikin! Em gerekî milet li vir derxin!

CANGÎR AXA – Keko, wan gotinan ne hilde ne jî dayne! Rev, ew ne pêşê mêran e! Keremke Rostemo!

ROSTEM - Belê wisane, ez benî. Rev û mêranî li hevdu nagirin! Bavo, tu bibaxşîne, ez gotinekî dixazim ji şêx ra bêjim. Helbet, li ber şêx min qelet kiriye xeberdim, lê îro xeberdan derheqa yazî û aqûbeta milet da ye. Şêx, çima em tenê ne? Kê got em tenê ne? Em çima vê gavê, vê saetê xwe bêxweyî û bêxudan dikin? Erê, dostê me ûris e, lê ew vê gave ne li vir e. Lê eşîrên me yên çûne li ser dînê îslamiyê? Em çawa dikarin pişta xwe bidin wan û lê din herin? Em çawa dikarin pişta xwe bidin welatê kal û bavan? Em çawa dikarin ermeniyên dost vî halî da bihêin? Na! Çûyîn a niha çê

nabe! Rev çê nabe!

ŞÊX EDO – Ya ermeniyan tu rast dibêjî. Helbet gerekî em dest-tewar rûnenên. Di derheqa misilmanan da, mirîdo, li ber min ne hilde, ne jî dayne. Qedr û rûmeta xwe, tu li destê xwe da bigire.

ROSTEM – Şêx, ez xulam, tu car Rostemê Xalitî, dîn nedaye dîndarê. Gotina min ew e, ku Roma Reş erd û xweliya me zeft kiriye, miletê me gişk ji xwe ra kiriye kole û hêsîr. Pêwîste, ku milet gişk, dîn û hebandinê bide alîkî, bibe yek, welat û xelkê xwe azad bike.

ŞÊX EDO – Tu ne rastî, mirîdo! Tu gotinên min têke xelek û têke guhên xwe, Rostemo! Dîn û hebandina xwe, gerekî em biparêzin. Ŭris qedir û rûmeta dîn û hebandina me digire. Ŭris xweyî û xudanê feqîr û jaran e. Divê em bikevin li bin perên ûris. Bavo guh nede li ser Rostem. Wî du eskerên romê li ber derê xwe dîtiye, lê lê ye xwe bîr bike. Rostemo, lawo, çavê xwe xweş veke! Misilman me hez nakin. Ewan nanê destên me jî naxwin. Ewan tu car tu car ji me ra nabin pişt.

ROSTEM – Şêx, tu hezar carî bibaxşîne min, ku ez li ber gotinên te va radibim. Hemû misilman ne yekin. Pir eşîrên kurmancan berê û paş da mêla me kirine. Ewan pir caran ji me ra bûne pişt. Ferezî em xwe ji dûrî wan digirin.

ŞÊX EDO – Gotina te çi ye, mirîdo? Tu dixwazî, ku êzdîxane li pey rêça te here. Tu dixwazî, ku em xwe li wan bigirin û bibin misilman?

ROSTEM – Keko, dijmin dixwaze me pîrepîreyî bike, me berî hevdu bide, weletê me û ziyaretên me, ji destê me derxe û ji dûr va li ser me bikene.

ŞÊX EDO – Kê ku li ser me dikene, bila bavê xwe bikene! Xelqê qelet kirye li ser me bikene! Dînê me û dînê misilmaniyê li hevdu nagire, Rostemo! Dijminê me pê devê te xeber dide, mirîdo! Min jî devê xwe daye ber devê wî, Bavo!

CANGÎR AXA – Şêx, camêrî bêrûmet neke, wî negotye em herin li ser dine misilmaniyê. Keremke, Rostemo!

ROSTEM – Bavo, ez yekîtyê dixwazim! Bila dîne her kesî li wî bimbare û pîroz be! Yekîtî îro ji me tê xwest. Em ku qewat bûn, her kesê qedr û rûmeta me bizanbe!

ŞÊX EDO – Yekîtî hilbet ne xirabe. Ez jî yekîtiyê dixwazim, Rostemo! Ewan çima li berbi me nayên.

ROSTEM – Ewan jî dibên, ku em xwe dûrî wan digirin. Yek me gerekî li ber yê din da daxe, keko! Awa çê nabe.

ŞÊX EDO – Kê? Ez? Ew yek ji min kêm e. Ez ezbim, herim stukura xwe li ber hinekan xwar bikim. Ew yek nebûye, tu car nabe! Rostemo, mirîdo, welleh billeh te xwe winda kiriye! Ew yek dest tirsê gihîştiye te. Tu were li ber ocaxa min, şêxê te yê tirsa te bigire. Tenê tu careke din tenişta xwe nexî, mirîdo!

CANGÎR AXA – Şêx bihêle, bila camêrî xeberde! Rostem bêje, gotina xwe mak bike.

ROSTEM – Bavo, helbet heger milet gişk li ser dinê kal û bavan bima, a naha kulek wê ji me kêm bûya. Me welatê xwe di destê xelkê va bernedida. Heger roja îroyin, em û kurmancên misilman ji hevdu ra nebûne pişt, siba wê dereng be. Hikumdarên Romê rengreş in. Durûtî, gevezetî û delkbazî pêşekê wan e. Ewan wê eşîrên me rakine rûyê hevdu, me qels bikin û piştê ji me bistîne.

ŞÊX EDO – Bavo guh nede li ser gotinên Rostem. Ew bi xwe jî nizane çi dibêje. Helbet, gotina Rostemê Xalitî da rasî jî heye. Rom delkbaze, durû û geveze ye. Ewan yên dev ji dînê kal û bavên xwe berdane û çûne, bûne misilman, ewan jî nerastin. Ew ku! Em ku! Dostê me ûris e! Dostê me ermenî ye! Çi karê me yê han, yê han ketiye.

ROSTEM –Bavo, xwîn nabe av! Ne berê û paş da hatiye gotin, ku eşîr bavê eşîrê ye. Destê zorê, pir eşîrên me bûne misilman. Dijminên me jî, wî tiştî ji bo kara xwe didin xebatê. Em di dewr û zemanan da xwalîser bûne. Me tim xizmeta xelkê xerîb kiriye. Bese, em gerekî li ser hişe xwe da bên. Em gerekî koç nekin, ji welatê xwe dernekevin. Em gerekî dost û dijminên xwe baş nas bikin.

ŞÊX EDO – Yên wek te dost û dijminên xwe nas nakin, Ros-

temo! Min jî devê xwe daye li ber devê te. Bavo, em ranebin!

CANGIR – Şêx, tu bêhna xwe fireh bike! Aql ji aqil zêdetire! Rostemo, çiqa te tê, gotina xwe kin girêde!

ROSTEM – Bavo, gotina min ew e, ku em û kurmancên misilman, em rezê darekê ne. Em birayên hevdu ne. A niha tirkên gênc bûne dijminên me. Divê temamiya millet tedbîr û tivdarekê xwe bike û pêşiya zulma tirkên gênc bisekine. Baş dibû, ku me qasid û beledên xwe bişanda hizûra axa û begên eşîran.

ŞEX EDO – Bavo, min wisa jî zanibû.

ROSTEM – Şêx, te çi zanibû?

ŞÊX EDO – Min zanibû, ku tu dixwazî me têkî hembêza misilmanan û me jî têkî misilman.

ROSTEM – Şêx, tu çi dibêjî?

ŞÊX EDO – Çi ku te bihîst, mirîdo!

ROSTEM – Şêx, rastiya dine awa nine.

ŞÊX EDO – Rastiya dine awa nine, lê çawane, Rostem? Ser hişê xwe da were, mirîdo!

ROSTEM – Şêx, tifaq û yekîtiya milet gerekî bê xurtkirinê.

ŞÊX EDO – Erê, lê çawa Rostemo? Ewana destkuja me jî heram kirine. Bavo, de tu bêje!

CANGÎR AXA - Rostemo, ne min got, kin girêde!

ROSTEM – Bavo, gerekî pişta me milet da germ be. Divê em pişta xwe milet da xurt bikin. Divê em dostan ji xwe ra zêde bikin. Divê em koç nekin û neçin welatê ûriş. Heger çûyîneke me hebe, gerekî em li welat derneyên, lê herin Şengalê yan jî Şêxanê. Wakî din tu çawa bêjî, ez benî, em ê wisa jî bikin!

ŞÊX EDO – Ev mirîd dîsa kerê xwe diajo. Bavo guh nedê.

CANGÎR AXA – De baş! Her pênc tilî ne yekin! Roja îroyin, kê dixwaze hebe, serê min hez kir, ez ê lingê wî hez bikim. Ermenî dostê me ne. Ewan cînarne qenc in. Ewan roja îroyîn ketine tengasiyê, em ê a niha rêkevin, herin hewara wan. Berî çûyînê, ji bo ku qidûnê şêxê min bişide, bila Reşîd ji me ra stranekî bêje. Reşîdo,

keremke! Diqewime berî stranê tu jî şîretekî ji me bikî, Reşîdo!

REŞÎD – Min li ber te qelet kirye, bavo!(Tiliya xwe dike guhê xwe, çend denga dikuxe û kulameke mêraniyê distirê).

.....

CANGÎR AXA – Reşîdo, dengê te ji me ra, kerema Xwedê jî, ji te ra!

REŞÎD – Ez destê te radimûsim, Bavo!

CANGÎR AXA - Şikir bengizê şêxê min xweş bû. Xwedê me rojekê bêy ocaxa şêx Edo neke! Gotinê şêx li ser çavan li ser seran! We got, erê!

ROSTEM – Êh! Em vê qûşê naçine Mûşê!

CANGÎR AXA – Rosto, te çi got?

ROSTEM – Ez ê çi bêjim, bavo? Destê min, bi destê te ra!

CANGÎR AXA – Rostemo, tu giregirê me yên gundên li vê nehiyê ra bêje, ku min gotiye. Ewan zêr û zîv, malê dinê ji bo kîjan rojê ra tof kirine? Bila misînê zêran li mal derxin, hûrkin, bidin çek, sîlih, cebirxane, hesp û zîn. Bila bi tedbîr û tivdarek bin; heywanê sitewir têkine qelî, nan û zexîrê bidine li ser hev. Dîsa dibêjim, zilamên bavçê çek û rihal bikin, hesp û zîn têkin li bin wan. Ewan bila bên û bigihîjin min. (Cangîr axa ji cî radibe). Ez ê a niha berê xwe bidim wan eskeran, yên êrîş birine li ser gundên ermeniyan. Şêx, tu dua bike!

ŞÊX EDO – Xwedêyo, tu oxira me xêr bikî! Axayo, şûrê te tim bira be û kevir li ber piyên te bibe penîr!

CANGÎR AXA – Rostemo, tu li vir dimînî. De ez te dibînim! Ez ê vê saetê wan bêbavan raqetînim, ji gundê ermeniyan derxim. Di Geliyê Maran da, ez ê li ser rêya artêşa Rom a Reş bisekinim. Rostemo, ez ê çavnihêrya te û komê bim. Ez di wê baweriyê da me, ku Andranîk Paşa û eskerê ûris jî, wê xwe ji me ra bigihînin. Reşîdo, keremke!

REŞÎD – Li ser çavan,bavo!

Bavo fermane, ha fermane,
Tirkên gênc bê dîn û bê îmanin,
Dibên hebandina me tûrane,
Heçê ne tirk, ewan dijmin û neyarên me tirkan e,
Û pê ketine, dibirin zar û zêçan, dibirin koka mêrane.
Bavo fermane, ha fermane,
Cangîr axa, axê êleke girane,
Dor xwe civandiye gelek mêrxasên êl û eşîran e,
Dibêje, rabin gelî şêr û egîtane,
Dibê çê bin, çê bixebitin,
Axa kal û bavan bêxweyî û bêxwedî nehêlin.
Ha yê, de ha yê.
Maşela mêrên camêr ra,
Pişt kirine pişta bavê Bava, axê êlê ye,
Ser rêya dijmin bûne mertala ha bi pola ye.
De ha yê, ha yê, ha yê.

CANGÎR AXA – (*Bi xwe dide pêşiyê*).

De bilivin gelî maqûlan! Em ê îro jî berê xwe bidin dijmin. Em û dijmin em ê îro jî teseliya hevdu bikin. Em li ser rastiyê ne. Em ê serkevin. Rostemo, min çi ku ji te ra got, bîra nekî!

ROSTEM – Belê, bavo! Ji we ra oxir be!

REŞÎD – (*Ser Rostem da mêl dibe, li ber xwe da dibêje*).

Tu rast î, Rostemo! Belkî Xwedê axriya me xêr bike.

Cangîr axa, şêx Edo û Reşîd diçin.

Dîmen a hevtan

Rostem bi tenê

ROSTEM – Em ê roja îroyin jî berê xwe bidine dijmin... Em ê siba jî berê xwe bidine dijmin... Emê dusiba jî berê xwe bidin dijmin... Lê paşê? Na, ew paşê tucar xelas nabe. Çimkî her axa û her begê me, başqe başqe berê xwe didin dijmin. Çimkî ewan ji hevdu bawer nakin û her yek ji wan hidûdê xwe diparêze. Her şêxek, her pîrek tenê xemê ji bo mirîdên xwe dixwe. Êh, aqilê min ji kirên me yên vê demê, vî zemanî jî nabire! (*Ew gazî lawê xwe dike*). Nebî, Nebî.

Dîmen a heştan

Ew û Nebî

Tiving di dêst da, Nebî derda tê.

NEBÎ – Çi ye, bavo?

ROSTEM – Lawo, tu yekî çapik û çelengî! Tu bikeve li nav gund. Tu mal mal bigere. Tu bêje xortên ture, ahil û ciwanan, kê ku destê wî dar digire, bila rabin û bên, li nav gund bicivin. Ev yek daxwaza axê yê. Bila bên, ji bo ku em xeberdin, şêwira xwe ji hevdu bikin. De bilive!

NEBÎ – Em ê herin şêr, bavo! Em ê lêxin?

ROSTEM - Lez nekeve, lawo! Çi ku min ji te ra got, wê yekê bike. Varazdat çawane? Bêhna wî hatiye li ber wî?

NEBÎ – Erê. Wî gava bihîs, ku Cangîr axa hatiye, perên wî hebûna wê bifiriya. Wî bihîst, ku êla me jî dikeve li nav şer, ew jî dixwaze li rex me bisekine. Ew dixwaze heyfa dê û bavê xwe, xwîşk û birayên xwe, pê destê xwe hilîne.

ROSTEM –Hûn lez nekevin, lawo! Hîn jî wextê te û Varazdat yê şer û dawekariyê nehatiye. De bilive, lawo! Here û gazî xelkê bike.

Nebî diçe.

Dîmen a nehan

Rostem bi tenê

ROSTEM – Were û vî tifalî ra bêje, ku şer ne lîsika zarokan e. Were û vî tifalî ra bêjê, ku xeraban û zulmkaran teslîmî Xwedê bike. Ne ev zarok çavên xwe vekiriye venekiriye, tim şer, talan birin û talan vegerandin, girtin û kuştin, li ber çavên xwe dîtiye. Hikûmet alîkî va, cerdevan û qaçax alîkî din va, rojê carekê rê li ber me dibirin, mêrên me dikujin. Berê û paşda, hal û wextê me wisa bûye. Sebeb jî dîn û hebandina me bûye. Hezar û sêsid sal e, li ser serê me tim ferman e. Wextekî xelîfê ereba dev kiribûn cegera me, niha jî osmanî ji me nahewin. Em çawa bikin? Herek ji me per û baskan ji xwe va neke û berê xwe nede erşê asîmana?

Dîmen a dehan

Ew û Perîşan

PERÎŞAN – (Derda tê û ji mêr pirs dike).

Evdê Xwedê, halê me wê çawa be?

ROSTEM – Nizanim. Tu tedbîr û tivdarekê me bibîne. Ez û lawên me yên mezin, em ê herin li ber şer.

PERÎŞAN – Çi bêjim? Feleka me xêrê nebîne! Min ewqas şer û talan li ber çavan dîtiye, ku dilê min bûye pola. Hêsir jî li çavê min da miçiqîne. Ma ez ê jî tivingekî hilnedim û li rex we nesekinim? Xwîna min ji xwîna we şîrintir nîne.

ROSTEM – Kengê min serê xwe danî li ser ax û berê sar, hingê jî tê tivinga min bavêjî milê xwe û rex lawên xwe bisekinî. Lê a niha tu li tev bûkan û zarokên hûr dimînî. Divê tu nevî û nevîçirkan mezinkî, firaxî. Heger em venegeriyan, tê ji zarok û torinên me ra qise bikî, ku em ji bo çi hatine kuştin. Em tim li ser heqiyê bûne. Lê heqî, di destê neheqiyê da, tim barebare. Belkî Xwedê, vê carê aliyê rastiyê binihêre.

PERÎŞAN – Çi bêjim? Oxira we oxira xêrê be. Tê Nebî û Varazdat jî li tev xwe bibî?

ROSTEM – Na! Nebî û Varazdat li mal da dimînin.

Dîmen a yanzdehan

Rostem, Perîşan û Varazdat

ROSTEM – Varazdat, lawo, em ê herine şer, lê tu û Nebî li mal da dimînin. Hûn herdu jî, şikir ne biçûkin, êdî xortin. Miqat miqatî xwe bin. Haya we ji der û doranê we hebe. Tim hişiyar bin. Hişiyarî çeka here giran e.

VARAZDAT – Zehf razîme, apo! Ez, tu car tu car, qenciya te bîr nakim! Te emrê min xelas kir! Apo, ez li vir namînim!

ROSTEM – Li ku da tê herî, lawo? Her derê agir ji asîmana dibare. Tu qet cîhkî da jî naçî, lawo!

VARAZDAT – Ez jî dixwazim bikevim li nav şer.

PERÎŞAN – Te çi got? Şerê çi? Sebir bike, lawo!

VARAZDAT – Çima ez ji kê çêtirim?

PERÎŞAN – Tu hîn jî zarokî, lawo! Wextê te yê şer û dawekariyan jî wê bê. Tenê tu lez nekeve. Tu xebera apê xwe bike, lawo.

VARAZDAT – Na, ez ê jî bêm, apo!

ROSTEM – Er ê, lawo! Xerabiyê çavên qenciyê derxistiye, nanê helal heram kiriye, xwîna sor reş kiriye! Dile te yê nazik qusiya ye, lawo! Apê te yê ji te ra gotinekî jî bêje. Pê qidumê şidyayî û çavên vekirî merî dikare bigihîje mirazan.

VARAZDAT – Hovîtî û sextekariyê, çavên min vekirine, qidûmê min şidandine, apo. Ez têm, ku pê destê xwe, heyfa dê û bavê xwe, xwîşk û birayên xwe, qewm û pismamê xwe hilînim!

ROSTEM – Heyfa çi, lawo? Em naçin heyfê hildin. Em diçim xwe biparêzin. Tu û Nebî jî, hûnê li vir bimînin. Li vir jî erk û wezîfeya we pir giran e. Divê li vir jî hûn ji nemerd û nekesan xwe biparêzin.

VARAZDAT – Apo awa çê nabe.

ROSTEM – Xeberdana zêde ne hewce ye, lawo. Hûn li vir bê kar û xebat namînin.

EZDIKI.COM

Dîmen a dozdehan

Ewan û Nebî

NEBÎ – Bavo, milet li nav gund civiyaye. Bêje, em çi bikin?

ROSTEM – Tu û Varazdat, hûn li mal da dimînin. Birayên te yên ji te mezitir, li tev zilamên gundê me yên bavçê, wê herin û bigihîjin Cangîr axa. Te bihîst? Ez, li tev çend giregirên gund, em ê herin, gund gund bigerin, qirara Cangîr axa têkine guhê her kesî. Paşê, ez ê jî herim bigihîjime Cangîr axa.

NEBÎ – Ji te ra oxir be, bavo!

VARAZDAT – Ji te ra oxir be, apo! Ez û Nebî jî, em ne biçûkin. Em ê ji dûr va bala xwe bidin we. Heger pêwîst be, em ê jî li pişt we bisekinin.

PERÎŞAN - Ji te ra oxirbe, bavê zarokan! Ser û guhên te li ser lawên me be. Ewan hîn gêncin, li nav qal û cengand da hasil nebûne. Nehêle, ku ewan ciyê tê û netê singên xwe bidin li ber gule û barûtên dijmin. Tu jî miqat miqatî xwe be! Ji bo me li ber xwe nekeve. Du şêrne wek Nebî û Varazdan li pişt me sekinîne. Xwedê piştovanê we be. Mertala Şems tim li ser milên we be!

ROSTEM – Xatirê we! Xwedê li ser da şahide! Em li ser heqiyê ne. Me vê carê jî nedixwest çekê bigirin destê xwe. Lê wekî din çê nabe. Em mecbûrin çekê bigirin destê xwe. Em mecbûrin xwe û xelkê xwe biparêzin. Em mecbûrin axa xwe li destê xelkê va bernedin. Lê heyf tifaq tune, milet bir'bir'î bûye. Xwedê ji me ra jî rehme. Hêviya me Xwedê!

Li ser dikeyê dibe tarî.

Awazeke muzîkê ya melûl.

Perde.

QEWMANDINA DUDAN

Dîmen a sêzdehan

Cangîr axa, Reşîd, şêx Edo

Pişt perdê dengê gulan, teqînya topan, ringeringa lingên hespan tê.

Ser dikêyê dibe ronî.

Avahiyê Rostemê Xalitî.

ŞÊX EDO – (*Bi lezgîn derda tê*).

Bavo! Bavo, ev çi ecêba reşe giran e? Bavo, çima gerekî awa bûya?

CANGÎR AXA – Te çi got, şêx?

ŞÊX EDO - Bavo, eskerê ûris dikişe, ji deşta şêr dertê!

CANGÎR AXA – Tu gazî Xwedê û Şems bike, şêx! Tu gazî mêr û milyaketên Xwedê bike, şêx! Tu dua bike, şêx! Xwedê ji me ra jî rehme, şêxê min.

ŞÊX EDO – Serê min qurbana Xwedê be, Bavo! Xwedê çi bike? Min got, eskerê ûris ji meydana şer dertê, diçe.

CANGÎR AXA – Şêx li welatê ûris da jî şer li tev daketiye. Li wir şoreşe. Ûris mecbûre, esker ji vir derxe.

ŞÊX EDO – Bavo, lê wê hale me yê çawa be? Ne em hindikin, bavo! Ne em ê li dest û pîyan da herin, mêrxaso! Bavo, ez bextê te da me, tiştekî bike, milet ji vê xezebê xelaske!

CANGÎR AXA – Şêxê min, her tişt pê xwestina Xwedê çê dibe! Xwedê ji me ra jî rehme!

ŞÊX EDO – Bavo, were vê care xebera şêxê xwe bike. Heger di ûrisêtê da jî şere, wisane çûyîna me li wir çê nabe. Em ê berê xwe bidin şexs û ziyaretên xwe. Em ê herin Gelyê Lalişê. Em ê sere xwe li ber qûba Şîxadî daynin. Em ê abebatî Xwedê bikin. Heta dergehekî xêrê li ber me jî vedibe.

CANGÎR AXA – Şêxê min sebirke! Tu wê yekê ji min ra bêje. Min sozê biratyê daye ermeniyan. Ez çawa dikarim roja îroyin wan li erafê meydanê, bi tenê û pêşberî dijminê devxwîn bihêlim? Namûsa min ra çi? Xîreta min ra çi? Tu şayîşa nekişîne, şêxê min! Tu xem û xeyala bide alîkî, şêxê min! Her mêrekî me sed mêrî ye! Em ê altkin! Em ê serkevin! Em ê ziyaretên xwe ji destê dijmin derxin!

Dengê gulan û topan zêde dibe.

Dîmen a çardehan

Hersêk û Rostem

ROSTEM – Bavo, awa çê nabe! Ez xulam, çarekî bike!

CANGÎR AXA – Te çi bihîstîye, Rostemo?

ROSTEM – Bavo, hesabê stêrkên asîmana heye, hesabê eskerê Rom a Reş tone. Ewan wek lêyî û lemiştê dikişin tên. Çarekî bike,axayo!

CANGÎR AXA – Rostemo, diqewime reş û peş hatine li ber çavên te?

ROSTEM – Reş û peşê çi? Tu bi xwe bala xwe bidê, mêrxaso!

CANGÎR AXA – (*Dûrbînê dide li ber cavên xwe).*

De na lo! Ne ewqase çiqasî tu dibêjî! Gotina te ji min ra çi ye, Rostemo?

ROSTEM – Bavo, em hewara xwe ji eşîrên me yên misilman, danexin? Em ku vê roja helebelê li hevdu nebûne xweyî, wisane bihayê me şeyîkî reş e!

CANGÎR AXA – Şêx, tu ji min û Rostem ra çi dibêjî?

ŞÊX EDO – Ez çi bêjim, bavo! Çaxê merî dikeve tengasiyê ji yarê dayîka xwe ra dibêje bavo! Em û ewan ne xerîbin, rezê darekîne. Koka me yeke. Ewan ji me çûne. Ne ku em ji wan çûne. Gilî û gazinê me ji wan heye.

CANGÎR AXA – Ez ne mêrê tûrika me, ne yê têra me. Ez ne hewcê şêwir û şîretên we me. A niha em nikarin pişta xwe bidin dijmin. Heta ez heme, meydana şer gerekî xalî nemîne. De zû, bidine

pêşiya min!

Ewan diçin.

Li ser dikeyê dibe tarî tarîstan.

Dengê gulan û topan nimiz dibe, dengê awazeke muzîkê ya melûl, ya şînê tê..

Li ser dikeyê ronahî vêdikeve.

EZDIKI.COM

Dîmen a pozdehan

Rostem, Nebî, Varazdat, paşê Cangîr Axa, şêx Edo, Reşîd

ROSTEM – (Li ber du cinyazan çok vedide û herdu destên xwe berbî erşa dike).

Xwedêyo, tu şahidê me û vê zulmê yî! Şemso, tu jî her tiştî li jor dibînî! Ev çi ecêba reşe giran e tê serê me feqîran? Çima em ji hevdu hez nakin? Çima her kes ji me dibê ez û ez ne tu kes! Çima tifaq û yekîtî li nav me da nayê çêkirin? Çima divê awa bûya? Çima gerekî roja îroyîn du lawên min jî bihatina kuştin? Çima divê ewqas şêr egîtên me, serê xwe danîna ax û berên sar? Heta kengê Xwedêyo tê me bicerbînî?

NEBÎ – Bavo, minetê nekişîne! Ez li pişt te sekinîme.

ROSTEM – Xwedê piştovanê te be, lawo!

VARAZDAT – Apo, ez jî li pişt te sekinî me! Tenê tu bêje, em çi bikin?

ROSTEM – Tu xweykirê Xwedê bî, lawo! Mertala Şems li ser milên we herdukan be! Heger vê qasê, vê demê, hûn nehatana û negihîştana min, wê dilê min biteqiya.

Cangîr axa, şêx Edo û Reşîd derda tên.

CANGÎR AXA – (Ew destê xwe datîne li ser girika milê Rostem).

Rostoyê min, ewan herdu jî ne tenê lawê te bûn, wisa jî lawên me bûn. Şere, çi bikî? Me serê gelek şêr û egîtan winda kir. Bila Xwedê ya heq nede ya neheq! Rabe! De tu rabe, mêrxaso! De tu bala xwe bidê! Xezebeke hîn girantir hêviya me ye.

ROSTEM – (Radibe).

Ji vê xezebê mezintir, ez bawar nakim hebe. Çi li me da maye? Rom a Reş gund û bajar li dest me derxist, qira mêra ji me anî, mal

û milkên me talan kir. Çi li me da maye, çî me heye, em ji bo çi bitirsin? Em bûne wek berxa bêxweyî û bêxudan, helbet em ê bibûna xurê guran. Şîn çîye, em nikarin pakî şîna xwe jî bikin. Ji vê xezebê zêdetir here ku, maqûlo?

CANGÎR AXA – Rostemo, pirtepirt milet ketye. Rê ya revê ketiye pêşiya milet. Dê ewledê xwe diavêje. Ra pê nabe, Rostemo!

ROSTEM – Ra, tenê ji mirinê nabe! Pêşiya rev û bezê gerekî bê girtinê! Kuştin û girtina me gerekî li ser axa kal û bavan be!

ŞÊX EDO – Rostemo, mirîdo, karê xwe bike. Em ê gazî Xwedê û Şems bikin, berê xwe bidin welatê ûris.

ROSTEM – Çawa? Reşîd şêx çi got?

REŞÎD – Wî got: em herin weletê ûris.

ROSTEM – Şêx, em milkên kal û bavan ji kê ra bihêlin? Em axa xwe ji kê ra bihêlin? Em merzelê xwe hêviya kê va bihêlin? Na! Ew şîret bavê min ji min nekiriye! Van cinyazan ez bê xweyî bê xwedî li vir nahêlim! Hûn diçin-herin, bila ji we ra oxira xêrê be. Kula min besî min e . Xatirê nave Xwedê kin, ji min vegerin.

CANGÎR AXA – Rosto, bêhna xwe fireh bike. Em ê herin, lê em ê paşda vegerin. Xwedê ji me ra jî rehme.

ROSTEM – Serê min qurbana Xwedê be, Bavo! Çima gerekî awa bûya, axayo!

CANGÎR AXA – Her tişt di destê Xwedê da ye, Rostemo! Ji me tê xwestinê, ku serê milet bidin li ser hev. Heçê heyî gerekî em ji vê xezebê xelas bikin. Tu karê xwe bike, em ê şev da rêkevin.

ROSTEM – Bavo, heger te wisa rê pê ra dîtiye, ez nikarim bêjim na. Li ber te min qelet kiriye. Lê merzelên kal û bavan em hêviya kê va bihêlin? Axa kal û bavan, em destê xelkê va berdin? Lê ermenî çi dibêjin?

CANGÎR AXA – Koçên ermeniyan jî dane li ser rê.

ROSTEM – Gelo haya serokên eşîrên me yên misilman ji me heye?

ŞÊX EDO – Çi karê me li tev wan heye?

ROSTEM – Çawa, çi karê me li tev wan heye?

CANGÎR AXA – Erê, haya wan ji me heye. Gelek ji wan mirina xwe razîne, lê çûyîna me nerazîne. Gelekan gotine, ku em pişta wan

vala dikin. Cimeta me rabûye li se rê. Li ku cimeta me, em jî gerekî li wir bin. Mayîn dest nade.

ROSTEM – Bavo, were vê carê çarekê bibîne, belkî hêlûna xwe, em pê destê xwe, kavil nekin.

ŞÊX EDO – Rosto, te xêre! Helbet, derda ne tenê te, lê me jî kor kiriye. Guh bide li ser şêxê xwe! Kê ku li vir ma, zora şûr jî mabe wê here li ser dînê misilmaniyê. Ya xêr ew e, em tûyî li ser hemû tiştî bikin, pişta xwe bidinê, lê din, herin.

ROSTEM – Şêx, yê ku îro merzelê kal û bavan da li bin piyên xwe, axa kal û bavan bêxweyî hîşt, milet bêpişt hîşt, wê siba-duh-siba dîn û hebandinê jî pêpez bike. Bavo, axayo, ez bextê kur û qîzê te da me, îlacekî bike, îmkanekî ji me ra bibîne, ku em ji cî nehejin. Reşîdo, de tu jî gotinekê bêje!

REŞÎD – Çi bêjim? Li ku bavo û şêx sekinîne, gotin ji min nakeve. Lê, vê carê, ez ê bêjim! Ez gotinên te qebûl dikim, Rostemo! Ez ewqas tişit dikarim bêjim. Wekî din jî bavo û şêx gerekî qerarê derxin.

ŞÊX EDO – De hûn li vir bimînin û bibine misilman.

ROSTEM – Şêx, tu çi dibêjî?

ŞÊX EDO – Çi ku te bihîst.

CANGÎR AXA – Roja îroyîn du rê li pêşya me hene. Rêk ew e, ku em li vir bimînin û herin li ser dînê misilmanan. Ya duda, em ji vir derkevin, dînê xwe biparêzin. Qerara min, ji vir derketin e! Em ê kuştiyên xwe bi şêx û pîr teslîmî axê bikin. Em ê milet têkine li bin perên xwe û ji vê xezebê xelas bikin. Em diçin, lê em ê dîsa paşda bizvirin. (Ser mile dikê yê çepê ringeringa lingên hespan tê). Reşîdo, de tu bala xwe bidê, çi hewale?

REŞÎD – Li ser çavan, bavo! (Ew bala xwe didê û bi eşq û şa, dibêje). Çend serokeşîrên me yên misilman tên hewara me.

ROSTEM – Şêx, te bihîst?

ŞÊX EDO – Kê jî tê li ser çavan, li ser seran!

CANGÎR AXA – Reşîdo, de tu here pêşiya mêvanan.

REŞÎD – Li ser çavan, bavo!

Reşîd dice.

Dîmen a şonzdehan

Cangîr axa, şêx Edo, Rostem, Varazdat, Nebî,
paşê Evdilmecîd beg, Cewar beg û Reşîd

CANGÎR AXA – Şêx, tu li ber serê herdu cinyazan bisekine, qewla bêje. Herdu zilam, bila rex Rostem rûnên û şîna xwe bikin. Evdimecîd Begê mêrekî mêrxas e. Ew xwerziyê me ye.

Evdilmecîd beg, Cewar beg, Reşîd derda tên

EVDIMECÎD BEG – Silava Xwedê ji we ra, gelî bira! Korayî! Cangîr axa, serê te û êlê xweş be.

CANGÎR AXA – Xêr hatî, Beg!

CEWAR BEG – Silavên min ji we ra, gelî maqûlan! Serê we sax be! Xwedê hew mezintir neke!

CANGÎR AXA – Xêr hatî, Cewar beg!

EVDILMECÎD BEG – Cangoyê bira, dibên her pênc tilî ne yekin. Lê tu were û binihêr, ku jana êsa wan, yek e. Dilê min pir dêşe, ji bo her lawekî me; ew êzîdî be yan jî misilman, li ba min firq tune.

CANGÎR AXA – Beg, şer e, dawekarî ye, bê kuştin û girtin çê nabe. Roja îroyîn pir mêrxasên me hatin kuştin. Mineta dijmin qirşek. Em meydana şer betal nakin. Evdilmecît beg, Cewar beg, rewşa cimeta ku hûn li nav tên, çawan e?

CEWAR BEG – Anegorî zemîn. Zeman jî ne tu zeman e.

EVDILMECÎD BEG – Dema ku dewra desthilatdariya osmaniyan xelas bû, me got wê bêhna me bê li ber me. Tirkên gênc hatin li ser text. Ewan hevt pehîn li gora sultanên osmaniyan xistin. Ewan qira ermeniyan anîn. Ewan dixwazin me jî pîrepîreyî bikin, riya koçberiyê bidin pêşiya me, axa me ji xwe helal bikin. Awa çê nabe. Tirkên gênc jî, îro-siba wê bikevin roja osmaniyan. Divê ewan

mirina xwe li ber çavan bibînin, lê çûyîna me ji vir, nebînin. Zû yan dereng dewleta me wê bê avakirinê. Wisane Cewar beg.

CEWAR BEG – Belê, beg! Lê pir axa û begên me, guhan da ker bûne, çavan da jî kor bûne. Ewan bûne kolên dewleta tirkên gênc. Ji bo wan yek e, kê ji me li vir diçe, kê dimîne. Xem û xeyalên wan, zikê xwe tijekirin, çîn mêdalya standin e. Siba-duhsiba tirkên gênc wê li ser stukura wan bêbavan jî siwar bibin.

EVDILMECÎD BEG – Cangîr axa tê ji vê meselê ra çi dibêjî?

CANGÎR AXA – Beg, tu mêrekî mêrxas û aqilmendî. Tu zanî çi dibêjî. Belê, miletê min riya ji welêt koçkirinê, riya çûyînê daye pêşiya xwe.

EVDILMECÎD BEG – Cangîr axa, ez zanim, tu mêrekî çê yî. Êl û eşîr maka merivan e. Te got, erê. Roja îroyîn dewleta romê li ser te nikare. Tu çima diçî?

CANGÎR AXA – Beg, milet ji qal û cengan westiyayî ye. Xelk gerekî bêhna xwe bistîne.

CEWAR BEG – Min bihîstiye, ku Tahar beg lingê xwe guhê xwe dixe û tengasiyê dide xelkên te. Gelo ev yek rast e?

CANGÎR AXA – Tirkên gênc destê xwe pişta wî dixin. Ewan çek û rihal didin wî, ji bo ku ew berê xwe bide me. Dibe jî, ku çavê wî li ser milk û malên me be? Dibe ku tirkên gênc sozê mal û milkên me dabine wî? Lê, wî vê gavê doza mêraniyê ji min ra daneniye. Ez naxwazim xwîn bê rêtinê û dijminatî bikeve li nav eşîra min û wî da.

EVDILMECÎD BEG – Ew ne raste! Ez hema îro da berê siwarên xwe didim wî. Piştî romê ew difire. Ez ê baskên wî ji kokê va rakim. Ez ê tûrikê parsekan têkim binçenga wî!

CEWAR BEG – Destê min destê te ra, beg! Ew xayîn e. Ew ji bo malê dinê xwe difiroşe. Ew yê kuştinê ye.

CANGÎR AXA – Na! Ne hewceye. Heger hewce bûya min ê êrîs bibira li ser wî. Gerekî berê eşîran li meydana şer da nekeve hevdu. Gerekî em xwînê ji hevdu bernedin. Dijminatî wê çê bibe. Dijminatiya me jî pir giran li ser me rûdinê. Ez rica dikim, ku êrîşê nebin li ser wî.

EVDILMECÎD BEG – De baş! Ez didim xatirê te. Lê tu qet

cîhkî da jî naçî. Heger tu rê tê ra dibînî, berê koça bide milkê min. Axa min têra me jî têra we jî dike.

CEWAR BEG – Cangîr axa ez û egîtên min, em li ber te sekinîne. Tenê tu navê çûyîne careke din neyînî li ser zar.

CANGÎR AXA – Evdilmecît beg, Cewar beg, ez minetdarê we me! Hûn ji birayên heq û helal çêtirin! Ez heta xweş bim, li rûbarê dinê bim, wê ser û guhê me li ser hevdu be. Dibên deve dûrî hevdu diçêrin, lê nêzîk guhên wan li ser hevdu ye. Em li ser oxirê ne. Hûn ji me ra oxira xêrê bixwazin.

EVDILMECÎD BEG – Axayo, çûyîn tim ji mayînê hêsantir e. Tu lez nekeve.

CANGÎR AXA – Evdilmecîd beg, tu ji min çêtir zanî, ku çûyîn û mayîn birayên hevdu ne, ne ew hêsaye, ne ev. Ez lez nakevim. Qerara çûyînê milet bi xwe derxistiye. Ez li vir heta mala Xwedê ji we herdukan razîme. Hûn baş bizanbin. Raste, ez diçim, lê berê min tim li we da bûye û wê li we da be! Şerê me û romiyan hîn jî xelas nebûye. Heger Xwedê hez bike, em ê dîsa li vir, li welêt da, hevdu bibînin. Tenê hîvîke min ji we maqûlan heye. Em parî nan li tev hevdu bixwin, paşê hûn biçin.

EVDILMECÎD BEG – Piştî van gotinan, nan li ber min da naçe. Ez çi bêjim? Heger we qerar kiriye, ji we ra oxir be. Ez li tev siwarên xwe, em ê we heta ava reş verêkin. Lê dîsa dibêjim, çûyîna te qet ne bi dilê min e.

CEWAR BEG – Ez jî li tev siwarên xwe, em ê pê pê li pey we bimeşin, pişta we biparêzin. Oxira we oxira xêrê be. Tenê tu me agehdar bike, ku kengê em bên.

CANGÎR AXA – Welleh hûn birane bêparin. Hûn li ser çavan, li ser seran ra hatine. Beriya çûyînê, ez ê qasidê xwe bişînin hizûra we.

Evdimecît beg û Cewar beg dicin.

Dîmenê hevdehan

Cangîr axa bi tenê

CANGÎR AXA – Xweş diniya ye! Ez, ez bim, gund û bajarên xwe vala bikim, deşt û zozanên xwe xalî bikim, çiya û baniyên xwe bêxweyî û bêxudan bihêlim. Êh, çi bêjim felekê ra? Însanên qenc yên nolî Evdilmecît Begê, Cewar Beg dibên ji welêt koça xwe bar neke, neçe. Rostemê Xalitî dibêje berê milet nede welatê xerîb, êzdîxana me vala neke. Lê ez çi bikim? Lê milet çi bike? Tirkên gênc ji me hatine xezebê. Ewan ermenî û xaçparêzên din, yên li vir, hemû kuştin yan jî berê wan dane berî û qumistanên Kîkan û Milan. Wan pir xelkê me yên bê sûc û guneh jî kuştin. Pir mêrxasên me jî di meydana şer da bûn cangorî. Heger awa berdewam bibe, kitek êzîdî çîye, kitek jî, ji vê xezebê xelas nabe. Şêx rast dibêje, çêtir dibe, em berê xwe bidin welatê ûris.

Dîmen a hejdehan

Ew, Rostem, şêx Edo, Reşîd

CANGÎR AXA – Şêx em çi bikin?

ŞÊX EDO – Bavo, ne te gotina tam da destê camêran! Hew zêdetir here ku?

ROSTEM – Bavo, heger tu rêke mayîn pêra dibînî, destê min bi destê te ra.

REŞÎD – Bavo, ez jî tim li ber te sekinîme!

CANGÎR AXA – Rêke mayîn, na, çê nabe! Berê koçan em ê bidin welatê ûriş! Milet westiyaye. Tirkên gênc jî devxwîn bûne. Di şev, nîveka şevê da, em ê rêkevin!

ŞÊX EDO – Rosto, te bihîst axê çi got? Tu li tev me tê yî yan dimînî?

ROSTEM – Ez jî têm. Ez van cinyazan jî li vir nahêlim.

CANGÎR AXA – Baş. Rostem! Tu bi kêfa xwe. Tu çawa rê pê ra dibînî, wisa jî bike. Gerekî em karê xwe yê koçkirinê bikin. Gerekî em pêşiya cimetê bikevin û ji hidûd derbaskin. De her kes ji me derbasî li ser kar û xebata xwe bibe. Xebata me pir e, riya me jî dûr.

ŞÊX EDO – Xwedêyo tu bêy hewara me. Şemso, tu me ji vê xezebê xelaskî. Xwedêyo tu axrî û aqûbeta milet xêr bikî.

Cangîr axa, şêx Edo û Reşîd diçin.

Dîmen a nozdehan

Rostem, Varazdat, Nebî

ROSTEM – (*Deyl herdu xortan dike*).

Şêrên min! heger bavê Bava riya koçberiyê daye pêşiya me, wisane rêke din tune. De hûn herin, ga erebê va girêdin û bînin li vir. Ez van herdu cinyazan li vir nahêlim. De bilivin.

NEBÎ – Li ser çavan, bavo!

VARAZDAT – Li ser seran, apo!

Herdu xort diçin.

Dîmen a bîstî

Rostem bi tenê

ROSTEM – Xwedêyo, gelo me xerabiya kê kiribû? Çima tu kuştin û girtinê hindik hesab dikî, me derodero jî dikî. Gunehê me çi ye, Rebê min? Ev çi zulm e, tu tînî serê me, Xwedêyo? Rehma te li ku ma? Tu çima hikumdaran dir û har dikî, feqîr û jaran jî dizêrînî? Bese! Rebê min, bese! Xwedêyo, ji xewê hişyar be! Pêşiya zulim û zinêkariyê bigire, Xwedêyo!

Perde

Pişt perdê miqameke melûl û dengekî zîz:

- Neçin! Malxerabno neçin. Hûn welatê xwe ji kê ra dihêlin? Hûn axa kal û bavan ji kê ra dihêlin? Neçin! Hûn ê poşman bibin, neçin. Hûn ê wek çenge garis li hevdu belav bibin û winda bibin. Neçin, neçin, neçin...

Dengekî qey bêjî ji binê bîrê dertê:

– Em ê vegerin. Em ê bên. Em ê bi tedbîr û tivdarek bên. Em ê ulim û zanistiyê li tev xwe bînin. Em ê bêguman bên. Em ê bên! Em ê axa xwe û ziyaretên xwe ji destê xelkê derxin.

Pişt perdê dengê meyê û dengekî zîz tê - Mêrên mêrxas û cimeta rûmet, li ku jî hebin, wê ji xwe ra rûmetê qazanc bikin. Sala 1918 an, meha gulanê, li Ermenistanê da, du şerne mezin li tev daketin. Eskerê Roma Reş êriş biribûn bi du milan va. Di pêşeniya Gumrî - Axbaranê da, Cangîr axa tevî 1600 siwaran tê hewara 6000 canfîdayên ermeniyan. Dijmin cinazeyên kuştiyên xwe meydana şer da bêxwedî dihêlin û direvin. Piştî çar rojan Cangîr axa êrîşê dibe li

ser Şevkî Paşa. Ew şer li deşta Sardarabadê da diqewime. Hingê eskerê Rom a Reş dubare ji canfîdayên ermeniyan zedetir bûne. Şevkî Paşa direve û meydana şer da laşê sê hezar eskerên xwe dihêle. Hetanî sala 1920 î, Cangîr axa û egîtên wî şûrê xwe nekirine kalanan, pêşberî eskerên tirkên gênc şer dikin. Cangîr axa di wê baweriyê da bû û ew amade bû, ku vegere welêt. Di welêt da jî, wê demê guhastin çê dibûn. Osmaniyan di şer da binketibûn. Împêratoriya Osmaniyan êdî nemabû. Li ser kavlê wê Împêratoriyê pir milet bibûn xwediyê dewlet. Qey bêjî wext û wede pêra gihîştibû, ku em jî bibin xwedî dewlet...

Awazeke muzîkê ya melûl.

QEWMANDINA SISIYAN

Dîmen a bîst û yekan

Rostem, paşê Cangîr axa

Pêşber avahîkî binerd. Ber derê avahî çend kevir.

ROSTEM – (*Ser kevirekî rûniştî ye. Cil û bergên wî kevn, xilmet. Ew melûl e. Tizbiya diavêje*).

Xêr, şer. Xwedê. Xêr, şer, Xwedê. Xêr, şer. Xwedê xêr bike, dîsa li ser şer xelas bû! Rebê min, tu bidî xatirê navê xwe! Ya xêr kîjan e, tu wê bikî! Tu bêy hewara xelkên bê sûc û bê guneh. Tu bêy hewara girtiyên hepsan. Tu me ji ya hîn xerabtir biparêzî. Tu rehmê têkî dilên desthilatdaran. Avakî li ser vî agirî da bikî, Xwedêyo!

CANGÎR AXA – (*Kincên wî jî kevn in).*

Roja te xêr. Rostemo!

ROSTEM – (*Serê xwe li ber xwe dernaxe û bi serê poz bersiva hogirê xwe dide*).

Xêr hatî.

CANGÎR AXA – Rosto, ne min silav da te!

ROSTEM – Min got, xêr xatî. Kolozê li ser serê te, welleh pir rind e, bejna te jî welleh bilind e.

CANGÎR AXA – Erê. Tu çi jî bêjî, bejna siwarê min tê. Ez ji te naxeyîdim. Guh bide li ser gotina min: mêrê camêr, merivê ketî naxe. Ew yek ne karê mêran e. Ez, ez bim, bikevim vê rojê û yên bi teherî te, qet xwe negirin, li ber min va rabin. Hikûmeteke wek

hikûmeta Romê ji min ditirsya. Tenê navê min saw û tirs dikir li ser eskerên romiyan. Xweş diniyaye!

ROSTEM – (*Serê xwe li ber xwe derdixe*).

Belê, xweş diniya ye! Ne te digot pişta min germ e. Dibe ku ew yeka te nedigot?

CANGÎR AXA – Erê, min digot...

ROSTEM – Lê ka pişta te, axayo? Ka welat, bavo? Ka milet? Em bûne wek qulingeke ji refê xwe qetiyayî. Ne Îhsa ji me dibe xweyî, ne jî Mûsa. Halê me ne tu hale, mêrxaso! Ka pişta te, ka leşkerê te, ka êla te?

CANGÎR AXA – Rostemo, vî welatî da hevtê û du millet cî û war bûye. Ewan gişk çawan, em jî wisa.

ROSTEM – Erê, ez ji bo vî welatî tiştekî nabêjim. Bila welatê Yekîtya Sovyêt şên be. Vî welatî me kire li bin perên xwe, xebat da me, qelem da destê me, kitêb û defter da li ber me. Me got, kulek ji me kêm bû. Me got, dewsa xeman tije bû. Me got, em ketine zikê dayîka xwe. Lê roja îroyin, êla me wek çenge garis, li nav vî welatî da belav bûye. Xelkê me bêserî, bêxwedî mane. Em ê windabin, herin, maqûlo!.

CANGÎR AXA – Em çawa bikin? Xelayî bû, nangiranî bû. Xelk ji bo xebatê diçin ciyê dûr. Lome ji xelkê nayê kirinê.

ROSTEM – Heger sedem tenê xelayî bûya, me yê bigota, ya Xwedê li ser çavan, li ser seran. Bêtifaqî ketiye li nav milet. Yek xêra yê din naxwaze. Li ser hevdu şikiyata dikin. Giliyên hevdu dikin guhên karmendên hikumatê.

CANGÎR AXA – Rostemo, tu bêhna xwe fireh bike! Geveze û durû tim hebûne. Xwedê axrîya milet xêr bike!

ROSTEM – Maqûlo, du lawên min wî berî Erez, di welêt da hatine kuştin. Ez havjiyê xwe ji wan tînim; xwezî ez jî hingê bihatima kuştin. Me koç kir û em hatin, derketin vir. Lawekî min şerê Axbaranê da hate kuştin. Rehma Xwedê li ser gora wî be jî. Wî ji bo heqiyê, serê xwe danî ax û berê sar. Wê pêlê, beriya çend rojan, çend kesên cilûbergên wan reş hatin, destê du lawê min girtin û

birin. Wan got, ku lawên min hevrikin, dijmin in. Berê wan jî dane sîbîra sar, şandin sirgûniyê. Vê yekê ra tê çi bêjî?

CANGÎR AXA – Çi bêjim? Wext, wextekî xerab e. Em gerekî miqat miqatî xwe bin. Divê haya me ji der û doranê me hebe. Gerekî dilê xwe li ber her kesî venekî.

ROSTEM – Axayo, çima me xerabiya kê kiriye? Çima divê em mîna dîza devgirtî bin.

CANGÎR AXA – Me xerabiya tu kesî nekiriye. Xerab li vir pir bûne. Ewan jî nizanin ji vê dinê çi dixwazin?

EZDIKI.COM

Dîmen a bîst û dudan

Herduk û şêx Edo

ROSTEM – Va şêxê me jî hat. Em binihêrin, ew ê ji me ra çi bêje?

ŞEX EDO – (*Kincê li ser wî jî ne tu kinc in*).

Şêxê çi? Te kengê xêra bavê xwe daye min? Çi ye, tu qestîka wisa dibêjî, ku min jî wek şêxên din bigirin, bibin û têkine heps û zindanan?

ROSTEM – Na, welleh ew tişt li fikira min ra debas nebûye.

ŞEX EDO – Lê gotina te çi ye? Lê çi fikira ji te ra derbas bûye, Rostemo? De şerm neke, bêje!

ROSTEM – Gotina min ew e, ku bi dest bêtifaqî û bêserî bûnê, milet pîrepîrey bûye. Lawên milet herekê serê xwe hildaye, ketiye kuncekî vî welatê mezin, yê bê ser û bê bin. Axrî û qedera me wê çawa be, şêx?

ŞEX EDO – Ay camêr, pakî pîrî li ciyê xwe da bihewe. Çi karê te cimetê ketye? Cimet, cimete, wê qenc yan jî xerab ebûra xwe bike. Xwestina te çi ye? Ya li bin zimanê te da çi ye? De tu bêje, Rostemo!

ROSTEM – Xwestina min hêç û pûç derket. Hiş û aqil jî li serê min da nemaye. Îro, ez mame û qalibê min yê vala.

CANGÎR AXA – Rostemo, mêrê mêr tim gerekî serbilind be. Xwedê ji me ra jî rehm e, Rostemo! Xema neke. Te hew dît, rêke xêr li ber me jî vebû.

ROSTEM – Xwedê dengê te bibihê, maqûlo! Nizanim. Navê Xwedê jî em tirsetirs didin.

Dîmen a bîst û sisyan

Hersêk û Reşîd

REŞID – (*Derda tê. Sistopisto rê diçe. Kincê wî, tu ku têlekî jê bikişînî, hezar pîne wê lê bikevin*).

Roja we bi xêr.

ROSTEM – Xêr hatî, Reşîdo! Derbazbe, rûnê.

REŞID – Te çi got Rosto?

ROSTEM – Min got, rûnê. Dibe ku tu ne Reşîd î? Te li ber bavo pante neda, destê şêx maç nekir. Em bala xwe bidinê, gelo kulamên te jî, ji bîriya te derneketine?.

REŞÎD – Rosto, xwe bîr neke.

ROSTEM – Min got, bi kerema xwe kulamekê ji me ra bêje.

CANGÎR AXA – Reşîdo, Rostoyê me îro pir bêhnteng bûye. Bi kerema xwe kulamekê bêje.

REŞÎD – Dengê min ketye. Lê, ji bo xatirê te, maqûl, ez ê bêjim.

Kolxozên me kanîne,
Hey lê, lê, lê, hey lê, lê,
Kolxozên me kanîne,
Hey can, hey can, hey canê...

ROSTEM – Na. Nebû.

ŞEX EDO – Çima nebû, Rosto?

REŞÎD – De, heger nebû, ez ê yeke mayîn bêjim.

Hezar heysid hevtê sale,
Şirîn Lênîn hate dinê,
Diniya xemilî, gul ketinê,
Miletên biçûk wî da xwendinê...

ROSTEM – Reşîd bese. Straneke mêraniyê bêje.
ŞEX EDO – Reşîdo, tu strana xwe berdewam bike.
REŞÎD – Baş.

Stalîn bavê me hemyan e,
Hey can, hey can, hey canê...

ROSTEM – Baş. Bese. Rûnê.

ŞEX EDO – Bêje. Reşîdo, bêje. Guh nede li ser Rostem. Ew bi xwe jî nizane çi xeberdide. Lê ez ya li bin zimanê wî zanim.

ROSTEM – Min çi ku dixwest ew yek jî got. Lê xwestina te çi ye, şêx! Vê carê tê me çi kelemê bixî?

ŞEX EDO – Ax derdê we mirîdan! Hûn me nahebînin, nehebînin, qe na qerf û henekên xwe ji me nekin, qedr û rûmeta me ra nelîzin. Ez nizanim, roja îrojin hebandina we çi ye? Bê hebandin hale we yê çawa be?

ROSTEM - Hebandin wî berî Erez ma, şêx! Ziyaret wî berî man. Mêrê mêrxas wî berî man. Hetanî stran, stranê Reşîd jî wî berî man. Mafê te tune, şêx, ku de'wa wê yekê ji me bikî, çi ku te pê destê xwe, ji me stand. Ew tu nîn bûy, yê digot xêra dê û bavê xwe daynin li ser kevir, wê qebûl be. Te çima nedigot, ku herekî me kevirekî welêt têkira berîka xwe û li tev xwe baniya. Em xêra bavê xwe daynin li ser kevirê kê? De bêje, şêx! Em xêrê daynim li ser kevirê kê?

ŞEX EDO – Xêr kete bîra te, mirîdo! De başe! Yek hebe xêra bide, kevir û xalî benda neanye dinê. Her derê kevir dimîne kevir.

ROSTEM – Tu wisa dibêjî, çimkî ew yek ji te ra dest dide.

ŞÊX EDO – Heger ji min ra dest dide, gerekî ji te ra jî dest bide.

ROSTEM – Na. Ji min ra dest nade.

ŞÊX EDO –We yê kevirên welat jî têkira hepsa, yan ê jî bida li nav çavên me. Ya xêr ew bû, ku me kevirên welêt li tev xwe neanî. We mirîdan, şêx û pîr nema, we da girtinê, kire heps û zindanên vir.

ROSTEM – Berî gişkî gerekî te bigirtana.

ŞÊX EDO – Çima? Çima gerekî min bigirtana? Min mala kê xirab kiriye.

ROSTEM – Ya milet!

ŞÊX EDO – Canim tu çi nahewî? Tu kê ji xwe ra milet hesab dikî? De tu jî wek hinekan dev ji êzdîyatiyê berda û biçyayî li ser dînê misilmaniyê. Hesêvankî misilmanan hindik xelqê me kuşt.

ROSTEM – Erê. Hindik kuştin

CANGÎR AXA – Rostemo, çavê xwe xweş veke!

ROSTEM – Ez rast dibêjim, bavo! Mirin ji vê bazarê çêtire. Ne wisane, Reşîdo?

REŞÎD – Nizanim.

ŞÊX EDO – Yên wek te, Rostemo, xenîmê sere xwe ne, xenîmê sere me ne. Zimanê xwe ji xwe bigire, mirîdo!

ROSTEM – Gotinên min rast in, şêx, lema tu diteqî.

ŞÊX EDO – Rastiya çi Rostemo? Yên ku tu ji xwe ra milet hesab dikî, ne hatin derketin vir, li ser vê axê, Axbaranê, koka mêran li vir jî ji me anîn.

ROSTEM – Tu çima rûkî defterê dixwînî, şêx. Tu çima wê yekê jî nabêjî, ku çima ew begê dost, ji me ra bû dijmin. Tu çima ya Evdilmecîd begê û Cewar beg nabêjî? Bavo de tu bêje! Ew yek raste?

CANGÎR AXA – Erê. Xwezî gişk wek Evdilmecît begê û Cewar begê bûna.

ROSTEM – Te bihîst, şêx? bêtifaqî ne başe.

ŞÊX EDO – Ez ji te çêtir zanim, ku yekîtî pêwîst e. Min rêya bêtifaqiyê nedaye pêşya we! Min gotiye dîn û hebandina xwe biparêzin!

ROSTEM – Lê çima, we şêx û pîran, kitêb û defter ji me heram kiribûn?

ŞÊX EDO – Bavo, de bêjê, de'w û doza wî li ser min çi ye?

REŞÎD – Nebû. Çîrokên we qet xelas nabin.

CANGÎR AXA – Bese! Xwe ker'kin! Mêrê mêr gotî gerekê tu car ji kirina xwe poşman nebe. Me mêrkîmî berê xwe da Rom a Reş û cimeta xwe ji nav dest û lepên tirkên gênc derxist. Me perçekî milet ji xezebê xelas kir. Me borcê xwe qedand. Em li vir sitar bûn. Gotine me: dev ji axatiyê û şêxtiyê berdin. Me ew yek jî kir. A niha hinekên din bûne serok û rêberên milet. Rêberiya milet, heger qenc be heger xerab, dîsa jî tê kirinê. Em bala xwe bidinê, axrî û aqûbeta me wê siba-duhsiba çawa be? Tenê tirseke min heye! Kal û bavan gotiye: " Çaxê diçî cîkî, dibînî hemû çavekî ne, tu jî çavekî be ". Heta niha,

hinek rêberên me yên nîvxwendî, dewsa çavekî xwe bigirin, çavê xwe û yê me jî derdixin... Ez çi bêjim? De, kîjan xêr e Xwedê wê bike! Reşîdo, tu bêje! Stranekê bêje!

REŞÎD – Erê bavo, em ji hevdu ra xurtin. Ji bo xatirê gotinên te, ez ê straneke mêraniyê bêjim, maqûlo! (Tiliya xwe dike guhê xwe û straneke mêraniyê dibêje).

Serayê ha serayê,
Sera Diyarbekirê dinihêrim ha bi more,
Reşîd paşa qolanê mile bavê Melo,
Şêx Mîrzeyê girtiye
Birye pîyê dîwanê ye jore.
Got: " Şêx, ez ji te ra dibêm, ji min ra were rayê".
Şêx Mîrzeyê got: " Ez bavê Melo me,
Kuştina min heye, serîke ew oxire,
Ez tucar tucar ji te ra nayême rayê".
Serayê ha serayê,
Sera Diyarbekirê da , sed yazix, çawa nayê
Dengê bavê Melo, şêxê êzîdîyan, şêx Mîrzeyê.
Serayê, ha Serayê,
Ez ê li sera Diyarbekirê dinihirim
Di êvar da, li tê da xalî nabe dengê tetera û qazada.
Şêx Mîrze, şêxê êzîdîyan gote Reşîd paşayê,
Got: " Reşîd Paşayo, wekî te ewlineta xwe bigota,
Min bizanbya,
Min ê şûrê xwe ye şîn, mertala xwe ya pola
Bi tedbîr û tivdarek ji mal baniya,
Yeqkî tu bizanbe,
Eseyî tu bizanbe, minê serê te jêkira
Li ser da danya" .
Serayê, ha serayê,
Ez sera Diyarbekirê dinihêrim devê rêye,
Hatin û çûyîna cimetê û alayê tevî lê ye,
Bira bavê min kiribe Miçoyê şêx Îsayê,
Welleh, bi navê xwedê, got, bi destê xwe
Hilda heyfa bavê Melo, şêxê êzîdîyan,
Şêx Mîrzeyê.

Dîmen a bîst û çaran

Herçar û du çêkîst

ÇEKÎSTÊ YEKEM – (Ew ketiye pêşiyê, demença "Makarov" dêst da, cilên ji çermê reş lê, kubar û pozbilind derda tê. Ew li bin çavan ra der û dor dinihêre. Paşê ew wek nêcirvanekî, linga heta sêrî yekoyeko maqûlên hazir mêze dike. Ew bi kîn û rik ji haziran pirs dike).

Hûn kî ne? Hûn li vir çi dikin? Serokê civîna we kê ye?

ŞÊX EDO – Ya bi xêr. (Ew destê xwe li nav rû û simbêlê xwe ra dibe, jor, li erşê asîmana dinihêre û li ber xwe da dibêje). Hebe tunebe evan Ezrahîl û Cibrahîl in.

ROSTEM – Bi gotina gotiya, em meriv û însanin.

REŞÎD – Em strana dibêjin. Ez stranekî ji we ra jî bêjim?

Kolxozê me kanîne
Hey lo, lo, lo, hey lê, lê...

ÇEKÎSTÊ YEKEM – Hiş. Lo lo, lê lê ya xwe ji xwe ra bihêlin. Hûn kî ne?

CANGÎR AXA – Lê hûn kî ne?

ÇEKÎSTÊ YEKEM - (Ew vedigere li ser hogirê xwe).

Te bihîst! Ewan dibên: "Em meriv û însanin". Ev ê han jî dibêje: "Hûn kîne?". Ewan ji me ra negotin: " Hûn xêr hatine". Ewan rûmeta me nizanin.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Ewan bi tenê destê hevdu maç dikin. Ewan ji hevdu ra dibêjin: axa, maqûl, şêx. Em lawên gundî û karkeran e.

Ewan jî axa, şêx, maqûl. Gotinên me ji bo wan, wek vingevinga mêş û mozan e.

ÇEKÎSTÊ YEKEM - Em wekîlê hikûmetê ne. Em Cangîr axa digerin. Kê ye ji we Cangîr Axa? Kê ye axê êlê?

CANGÎR AXA – Ez im Cangîr Axa.

ROSTEM – Ez im Cangîr Axa. Gotina we çi ye?

REŞÎD – Ez im yê ku hûn digerin.

ŞÊX EDO – Ez im Cangîr axa.

ÇEKÎSTÊ YEKEM – (Demençê hewa ba dike).

Ez, ne ez bim, ku we herçaran jî negirim û nebim.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Wele herçar jî yê kuştinêne. Ewan xwîna me xwarine. Berê û paş da, ked û qazanca êzdîxanê zikê wan da bûye.

ROSTEM – Kuro, lawo, ne em bûn yên malbeta we ji destê tirkên gênc derxist. Heger ne em bûne, tu ji dayîkê nedibûyî. Te çilên reş li xwe kiriye û tu hew zanî ev diniya diniya te ye, kuro?

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Erê! Wisa jî heye. Ev welatê karker û gundiyan e.

ÇEKÎSTÊ YEKEM – Heger we negot, kê ji we Cangîr axa ye, ez ê we bidim li ber gulan.

CANGÎR AXA – Ne min got. Ez im Cangîr axa. (Ew radibe).

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Er ê ew bi xwe Cangîr axa ye. Ez wî nas dikim.

ÇEKÎSTÊ YEKEM – De zû bide pêşya me, axa!

CANGÎR AXA – Şikir, dîsa ez bûn axa, dîsa ez bûm xwediyê navê xwe!

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Zû bide pêşya me! Kêm zêde xebernede.

REŞÎD – Kuro, lawo, ew mêrê devê te ye, ku tu wî didî pêşya xwe?

ROSTEM – Ew mêvanê min e. Ez heta xweş û rûbarê dinê bim, ez nahêlim, ku hûn wî bibin.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Tu nehêlî, em ê bi destê zorê wî bibin.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Em ne eskerê Rom a Reş in. Em xelkê bê sûc û bê guneh nagirin û nakine hepsê.

ROSTEM – Lê sûcê axê çi ye?

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Wî tiştî ez nikarim bêjim. Dadger wê bêje, sûc û gunehê wî heye yan jî na. Heger sûc û gunehê wî tune, ew ê îro yan siba li ser we da vegere.

CANGÎR AXA –Xuyaye xeletî çê bûye. Ez ê vegerim. Hûn bêhna xwe fireh bikin û hêviya min bisekinin. Hûn şahide, min xêncî qenciyê, tu tiştekî din nekiriye. Qencî jî, dibên, ku vê dinê da deya û badilhewa naçe. Hûn dengê xwe dernexin, xwe ziyan û xeterê dûr bixin. Hema roja îroyîn jî ez ê paşda bizvirim.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – De zû, bilive! Wextê me yê xeberdana dûr û dirêj tune.

Dîmen a bîst û pêncan

Ewana û Perîşan

PERÎŞAN – (*Mal dertê, çav wê ecêbê dikeve, cokê xwe dukute*).

Weyê weyê, ev çi ecêba giran bû, ku hate serê me? (Deyl mêran dike). Laçika min li sere we be, ne bavê Bava dibin. Ne axayê êlê dibin. Hûn çima cîh da bûne kevir. Ne hûn mêrne mêrxasin. De rabin, pêşiya vê nerastiyê bigirin.

ŞÊX EDO – (Ew li ser riya Perîşanê disekine).

Dayê, xwîşkê, bihewe, te ji me xêr e? Ewan hikûmetin. Pê ra xeberdan nabe.

PERÎŞAN – Şêx rehme bavê te be, li ser riya min dûrkeve. Filankes, tu çima dengê xwe dernaxî? Ne bavê Bava digirin, dibin.

ROSTEM – Evda Xwedê, ji destê min va çi tê û ez çi bikim? Heger roja me jî hatibe, em ê jî bêne girtin, yan jî kuştin. Lê heyf em nizanin, kuştin û girtina me wê bi destî kê be? Tu here mal. Ev kar, ne karê jinikan e. (Ew dibêje çêkîstan). Ne min got, ku ew mêvanê min e. Em jî eşîrin. Mafê min tune, wî bidime destê we. Bêjine mezinê xwe, ew ê ji min fehm bike.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Mezin ez im.

CANGÎR AXA – Çawa? Lê hevalê Poxosiyan?

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Tê hevalê xwe, Poxosiyan, li wê dinê da bibînî. De bilive!

Dîmen a bîst û şeşan

Ewan û Nebî

NEBÎ – (Bayê bezê li mal dertê).

Dayê, bavo, çi hewale? Ez kêxim?

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – (Berê çekê dide Nebî).

Tu gavakî jî pêşda hatî, ez ê te geverkim.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Hûn nezanin. Em heçî kedxur li nav we derdixin, dibin.

PERÎŞAN – Min jî bibin. Ji min ra yeke hestyê min li bin axa kê da birizin.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Em ê te jî bibin.

ROSTEM – Min jî bibin.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – De tu jî bide pêşiya me.

ŞÊX EDO – Min jî bibin.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Em ê te jî bibin.

REŞÎD – (Du gava paşde diçe).

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Li ku da?

REŞÎD – Min jî bibin.

ROSTEM – Lema dibên: heger kurmê darê ji darê nînbe, zewala darê tune.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Te çi got?

ROSTEM – Qet.

NEBÎ – Bavo, ez çi bikim?

ROSTEM – Dengê xwe dernexe, lawo!,

NEBÎ – Na, ez ji wan natirsim...

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – De tu jî bide pêşya me! Xuyaye, ku tu jî troskîstî.

PERÎŞAN – Qîra qijikê. Ev çi navne teze ne, ku hûn didine li ser me.

ROSTEM – Vê carê jî em bingeha xwe bêxwedî dihêlin. Axriya me wisa ne. Feleka me xêrê nebîne.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – (Rostem dehf dide).

De zû bilive! De hûn gişk bidine pêşiya me.

Dengê awaza muzîkê ya melûl.

Perde

EZDIKI.COM

QEWMANDINA ÇARAN

Koçika asayîşa/komîtêya bêqeziya bûna dewletê. Li dîwarê pêşber va şikilê Stalîn û Djêrzînskî. Li ser dikeyê da textê nivîsarê, têlêfon, mekena nivîsarê, kursiyên darîn. Du keç rûniştine dor textê nivîsarê.

Dîmen a bîst û hevtan

Sûsîk û Sonîk

SÛSÎK – (Neynûkê xwe êge dike, hilû dike, û bin bêvla xwe da kulamekê dibêje).

Lawikê min çû Rewanê, hey canê,
Lawikê min çû Rewanê, hey canê,
Tu êmîşê cêbanî, hey can, hey can, hey canê...

SONÎK – (Neynik daye li ber xwe, çav û biriyên xwe kil dike).
Xweziya min ji te tê, Sûsîk!
SÛSÎK – Çima?
SONÎK – Dilê te da tim eşq û şabûn e.
SÛSÎK – Tu jî şa be, Sonîka delal. Kê destê te girtiye?
SONÎK – Êh, nizanim! Bihara îsalin xwe derengî êxist. Li der va sar e, guregura ewran e. Baranek bibariya wê çêtir bîbûya. Perça dilê ewran wê daniya. Ewr jî hêviya birûskê ne. Tê bîriya te, em par, van çaxan, li ku bûn?
SÛSÎK – Nayê bîra min duh min çi xwariye.
SONÎK – Em li tev serokê me yê pêşin, Poxosiyan, mêvanê

êzîdiyan bûn. Goştê wan qelandibû gelekî tam bû. Heta roja îroyîn ew tam li bin zimanê min da ye. Roj li ser serê me ra bibû tas. Pelên daran dibiriqîn. Darên şevtelan, sêvan û zerdelan, bişkokên xwe vekiribûn. Ewan pê gulên rengrengî xemilî bûn. Serokê me, du çirpiyên darê yên bi gulava xemilî bûn, da destê min û te.

SÛSÎK – Ew tişt çima ketin bîra te?

SONÎK – Nizanim. Bîna wî çirpîyî û wan kulîlkan, heta niha jî li pozê nim e.

SÛSÎK – Serokê me yê teze ciwan e.

SONÎK – Te ew dîtiye?

SÛSÎK – Erê. Dibên, ku li Moskvayê ew perwerdeyî bûye. Te Moskiva dîtiye?

SONÎK – Na.

SÛSÎK – Min dîtiye. Min Stalînê mezin jî ji dûr va dîtiye. Moskiva pir pir mezin e. Ew pir pir bedew e. Li ser Meydana Sor da jî, qey bêjî pir pir xwîn hatiye rokir.

SONÎK – Te li wir, êdî "pir pir" çi dît?

SÛSÎK – Evd û însan li wir pir bûn. Lê şabûn hindik bû. Milet xemgîn bû.

SONÎK – Tu derheqa serokê me yê teze da biaxive. Ji ku hatiye, eslê wî çi ye?

SÛSÎK – Ez tenê paşnavê wî zanim; Îstambûlsiyans.

SONÎK – Îstambûl sya ns? Devê min vajî bû. Ew ji tirkiyê hatiye?

SÛSÎK – Hiş. Hêdî. Ew kevçî av da dixeniqe.

SONÎK – Lê te digot wî nas nakî? Min tiştekî xirab negotye.

SÛSÎK – Te ew kire tirk.

SONÎK – Ez di bextê te da me, wan gotinan ne hilde ne jî dayne.

SÛSÎK – De baş! (Dikene). Poça te, di îro da, li bin lingê min da ye.

SONÎK – Em hevalên hevdu ne. Ez di wê baweriyê da me, ku tu min nafroşî.

SÛSÎK – Kê zane?

SONÎK – (Di guhê hevala xwe da diaxive).

Te bihîst. Heger îro poça min kete li bin lingê te, lê poça te ji zû va li bin lingê min da ye.

SÛSÎK – Baş. Min te fem kir. Were em mijarê biguhêzînin. Dena pora, tu li ku peyda dikî?

SONÎK – Tu îro were mala me, ez ê bi xwe porê te denê da bikim.

Dîmen a bîst û heştan

Ewan û çêkîstê duda

ÇÊKÎSTÊ DUEM – (*Ew derda tê. Fîtefîta wî ye. Di destê wî da patîfon e*).

Roj we xêr keçikno! De bala xwe bidinê, min ji we ra çi aniye?

SONÎK – Xêr hatî, heval Qero!

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Di vê rojê da, em ê bikevine zikê dayîkên xwe.

SÛSÎK – Peh, çi tiştekî baş e.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Serokê me yê nû, cîh bi cî zêr e, zêrê zer.

SÛSÎK – (*Patêfonê vêdixe. Awaza muzîkê ya tangoyê dike guhê haziran*).

Zor sipas. (*Ew dikeve hembêza Qero û direqise*).

SONÎK – Maşellah, hûn bêqisûr direqisin.

Dîmena bîst û nehan

Ewana û çêkîstê yekê

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – (*Ew derda tê û hilmeyî Qero dike*).

Ev çi ye, heval?

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Art. Padgatovka(Bombebaran a beriya êrîşê).

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Tu ewqas tişt ji ku zanî, kuro?

ÇÊKÎSTÊ DUEM – De zanim! Ev a han Sonîk e, ev jî Sûsîk, hevalê Stembûlyan.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Ne ku Stembûlyan, lê Îstembûlsiyans, kuro!

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Bibaxşîne, heval!

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Dengê patêfonê bibire. Kê ji we Sûsîk e, kê Sonîk.

SONÎK – Ez Sonîk im.

SÛSÎK – Ez jî Sûsîk im.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Hûn zanin li ku xizmetê dikin?

SÛSÎK – Erê.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Min nebihîst.

SONÎK – ÇK-ayê da.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Ordiya hikûmetê ya here bi hêz da hûn xizmetê dikin. Dijminê me, yên hundir, pir in. Divê em tim hişiyan bin! Tu kuro yî, Karo yî, Qero yî, k'ero yî, çi yî? Patêfonê bide ser.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Navê min Qehreman e.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Qehremaniya te, roja îroyîn, min li ber

çavan dît. Eferîn! Te xweşmêrek, axê êlekê kire tora me.

SONÎK – Kê? We îro kê kire hepsê?

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Mêrxasê êzîdiyan, Cangîr axa...

SÛSÎK – Çawa? We Cangîr axa girtiye?

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Dilê te çima şewitî, Sûso pîso.

SÛSÎK – Malbeta me, Cangîr axa û Andranîk paşa, rizgar kirine.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Navê wan herduka careke mayî neyne li ser zar. Qero tu Cangîr axa bîne vir.

ÇÊKÎSTÊ DUEM – Li ser çavan, Qumandar!

Çêkîstê duda diçe.

SONÎK – Bi destûra te, ez jî herim.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Tu naxwazî bibînî, ku ez ê çawa wî mêrxasî bişkênim?

SONÎK – Na, serê min dêşe.

SÛSÎK – Ez jî dixwazim herim.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Badilhewa hûn ji xwîna dijminan ditirsin. De pak, herin!

Sonîk ê Sêsîk diçin.

Dîmen a sîyî

Ew, çêkîstê duda û Cangîr axa

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – (*Bi ken û fen*).

Keremke axayo! Fermo mêrxaso! Derbasî serê jorin bibe! Rûnê! Tu xêr hatî, maqûl! Tê ji me ra çi bêjî?

CANGÎR AXA – (*Serbilind, nêzîkî niçê dikê dibe û tevî temaşevanan, ew xeberdide*). We dît? We bihîst?

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – (*Ew deyl Qero dike*).

Kuro, tu rastî jî k'ero yî. Te çima destên rêberê miletê xwe girêdaye? Cangîr aza, gelo tu ji xwedê bawer dikî?

CANGÎR AXA – Erê.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Dibên çaxê te pêşberî tirkan şer dikir, her êvar çaxê te kirasê xwe dêxist, bara û cema gule diketin erdê? Dibe ku Xwedê nedihîşt, ku gulên tirkan canê te da herine xwarê?

CANGÎR AXA – Şerê me ji bo heqyê bû.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Te Andranîk Ozanyan nas dikir.

CANGÎR AXA – Em kirîvên xwînê bûn. Em destebirakê hev bûn.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Ew çima li vir nema? Ew li ber me revî.

CANGÎR AXA – Ew ne mêrê revê bû.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Ew daşnak bû. Wisane tu jî daşnakî.

CANGÎR AXA – Em serbaz bûn, serbazê azadiyê.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Tu dostî yan dijmin?

CANGÎR AXA – Dostê kê û dijmine kê?

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Ne tu axa bûy, xwedî milk û mal. Her tişt

me ji te sitend. Helbet tê dijminatiya me bikî.

CANGÎR AXA – Na. We tu tişt jî ji min nestandiye. Milk û malên xwe min qurbana cimetê kir. Ez mam û milet, wê yekê jî, tu kes nikare ji min bistîne.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Te cimet kir ya xwe. Te got, ku destebirakê Andranîk paşa bûy. Ev herdu tişt bese, ku tu û hogirên te, heta hetê ji hepsê derneyên. Lê ez zanim, ku te gelek tiştne qenc kiriye. Tenê tu rastiyê bêje. General Sîlîkov jî hogorê te bûye, ne wisane?

CANGÎR AXA – Na. Ne wisa ne.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – (*Ew diçe li ber mekena nivîsarê rûdinê. Dibe çeqeçeqa mekenê*). Ez, Cangîr Axa, bi xwe endamê partiya daşnaka bûme. Piştî binketina daşnakan, bi qerara partiyê, ez li Yekîtiya Sovyêt da mam, ji bo ku hîm û bingeha vê hikûmetê hilşînin. Ji bo wî karî, min dor xwe civand Rostemê Xalitî, Şêx Edo, Reşîdê dengbêj û gelekên din

CANGÎR AXA – Her tiştên te got vir û derew in.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – De tu bêje, rastî kîjane? Tu kê yî?

CANGÎR AXA – Êl maka merivan e! Tu min çêtir zanî ez kê me.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Tu dijminî, dijminê cimetê, dijminê gel!

CANGÎR AXA – (*Berê xwe dide cimetê – temaşevanan*).

We dît! We bihîst! Xwedê ya heq nede ya neheq! Min kirin dijmin, ew jî dijminê cimetê. Na. Naqewime. Ev yek xewne. Ev yek xewneke fehş e. Cimeta giran, ma ez dijminê we me? (Deng û his ji cimetê dernayê). We çi got? Diqewime ez guhan da ker bûme? Na, we xwe kerî danye. Ne himîn ji we tê, ne gimîn. Hûn tirsiyane. Saw ketye li ser we. Netirsin! Cimet her kesî lazimin. Xeberdin! Ji min ra bêjin. Bêjin, axayo tu dijminê me nînî. Bêjin, axayo ew yek vir û derew e. Bêjin axayo, te me ji dest û piyê Rom a Reş derxist. Bêjin maqûlo, te û Andranîk, we me rizgar kir. De bêjin! De devê xwe vekin! Hûn xwe kerî û korî datînin. Ev çi ecêb e? Diqewime hûn bîrsar bûne. Çi kîn û rike hûn ji min ra dikişînin? Heger kîna piştdayîna warê kal û bavan, wisane hûn rastin. Gerekî ew yek min

nekira. Kuştin û girtina me gerekî li ser axa me bûya. Hûn rastin. Xeyda we cî ye. Ez nebûm xwediyê sozê xwe. Ez nezivirîm, venegeriyan, li ser warê kal û bavan. Çî bikim? Çerxa me çep zivirî. Axrî û aqûbeta me pûç derket. Jîyana min kêrî çi tê?

Awazeke melûl.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – (*Tê û nêzîkî Cangîr Axa dibe*).

Tu dijminî, dijmin!

CANGÎR AXA – Bêje, bêje!

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Li bin vê kaxezê da îmze bike.

CANGÎR AXA – Tilî û pêçiyên min hînî çekê bûne.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Tu û hogirên te, hûn gişk cesûsê tirkan in.

CANGÎR AXA – Nemerdê lawê nemerda. Te tirkên gênc derbastir kir.

ÇÊKÎSTÊ YEKEM – Tu naxwazî hogirê xwe bibînî.

CANGÎR AXA – Erê. Dixwazim.

Çêkîstê yekê tevî yê duda diçin.

Dîmen a sî û yek

Cangîr axa bi tenê

CANGÎR AXA – Ev çi ecêb bû. Min kirin cesûs. Cesûsê kê? Yê dijmin. Min kirin dijmin. Dijminê kê? Dijminê cimetê. Min çi anî serê xwe. Min çi anî serê miletê xwe. Min çawa destê xwe ji warê kal û bavan kir. Min çawa berê xwe ji ziyaretên xwe guhast. Xwedê li ser da şahide. Em mecbûr bûm, ku ji walêt koça xwe barkin. Dibe ku çêtir dibû, li ser warê kal û bavan ez bihatima kuştin, ne ku biketama destê nemerd û nekesan? Nemerd û nekes wê me bê gor û merzel jî bihêlin. Min çi anî sere xwe?

Dîmen a sî û dudan

Ew, Rostem, Perîşan, Nebî

ROSTEM – Bavo, xwezî ez herdu çavan da kor bûma, tenê vî halî da min tu nedîtayî.

(*Cangîr axa li nav fikir û mitalan da ye*).

PERÎŞAN – Evdê xwedê, em herin û paşê bên.

ROSTEM – Paşê tune. Dem, dema xatiran e.

PERÎŞAN – Wey li min porkurê. (*Ew digirî û dilûbîne*).

CANGÎR AXA – (*Serê xwe bilind dike*).

Rostemo, tu xêr hatî. (*Berbirî Perîşanê dibe*). Dayê bêje. Diloka bêje û bilûbîne.

PERÎŞAN - (*Dilokê diavêje li ser lawên xwe yên cangorî bûyî û cangoriyên din*).

ROSTEM – Bavo, em çi bikim?

CANGÎR AXA – Rostoyê min qet dey neke. Kirina çi? Tu jî dilokekî bêje. Tu birao, birao, birao, bike. Tu navê me jî bide. Em mirîne, lê hê jî neçalkirîne.

ROSTEM – Bavo, em hewara xwe Baroyê lawê dostê min, lawê Mûşêx, danexin?

CANGÎR AXA – Ewan, ew jî kuştine.

PIRÎŞAN – Çawa?

CANGÎR AXA – Bêhna xwe fireh bikin. Ev yek jî ya Xwedê ye. Ev pêla qarxûn û tofanê jî wê li ser miletê me ra derbaz bibe. Xwedê xêre. Mêrê zane wê bên li ser text û tacê dostan. Ewan wê kirên îroyin rezîl bikin. Ewan nave me wek nave mêrxasan pê herfê zêrîn nava dîrokê da binivîsin. Cimetê kulam û strana bavêje li ser

me. Wê heykelê me çêkin. Li nav me da jî wê xwendî û zane derkevin. Yekîtiya milet wê bê xurt kirinê. Warê kal û bavan wê zû yan dereng serbest û azad be. Ziyaretên me jî wê bên azad kirinê. Heyf wê yekê em ê li ber çavan nebînin...

ROSTEM – Bavo, tu dibêjî, ku miletê me wê nehele, winda nebe?

CANGÎR AXA – Na. Heger em welêt da jî bimana, dîsa nedihelyan. Min xebera camêrekî wek te nekir. Çi bêjî? Şuxula çûyî meriv pey nakeve.

EZDIKI.COM

Dîmen a sî û sisiyan

Ewan û şêx Edo

ŞÊX EDO – (*Ew derda tê, destên xwe berbi erşê asîmana dike, dest dua û dirozga dike*).

Xwedayo, te çi anî sere me? Bavo, em ketin çi rojê? Rostemo, rehme bavê te be, tu rast bûy. Me bi xwe ji hevdu bawer nedikir. Me tivaq û yekîtiya xwe çê nekir. Me axa xwe ji destê xelqê va berda. Çiyayê Şengalê wî berî ma. Gelyê Lalişê wî berî ma. Êzdîxan, Êzdîxan destê xelqên xerîb da ma.

ROSTEM – Şêx, bêhna xwe fireh bike. Tu şêx î, erk û wezîfeya te ye dîn û hebandin parastin. Kêmasî û xeletiyê me hemiyan jî hebûn. Çi bêjî? Ji destê me çû.

CANGÎR AXA – Belê, kal û bavên ne rast gotiye: kevir, ku ciyê xwe leqiya, pir çetine, ku dîsa ciyê xwe bigire.

Dîmen a sî û çaran

Ewana û Reşîd

REŞÎD – Bavo, ev nifira kê bû ji me qebilî? Şêx, em ketine çi rojê? Rostemo, rehme bavê te be, gelo te zanibû, ku ev roja wê roja me be?

CANGÎR AXA – Reşîdo, Xwedê milet ya hê xerabtir xweyke. Bese em saxe sax xwe çal bikin, binivêjin, qewil û beyta bi xwe li ser xwe da bêjin. Tu stranekê were, Reşîdo! Straneke mêranyê. Straneke egîtiyê! Straneke mêrxasiyê! Em diçin, lê em lawên xwe, em milet li pey xwe dihêlin! Em ne bêhêvîne. Hêviya me li jor xwedê, jêr jî ewan in. Ewan wê qelem û defterên me bigirine destê xwe. Ewan wê bibin nivîskar, fîlosof, ulimdar û seyasetmedar. Heger pêwîst be, ewan wê şûr û mertalên me hilgirin! Ewan milet bê dewlet jî nahêlin. Ewan wê Êzdîxan a azad û dêmokirat ava bikin. Dîsa şikir ji vê gavê ra. Dûyê ocaxên me dikişin. Keremke Reşîdo!

REŞÎD – Li ser çavên min, bavo!

Were lo bavo, lo bavo, lo bavo,
Lo bavo dilê min kovana sibêye,
Lo xweyo dilê min kovana sibêye,
Minê bala xwe dayê Cangîr axa,
Axayê êlê, kekê Fetla,
De rênga Remequlyana wêran da
Kafir Hirço sîyare...
De tu berdê, kekê Fetla de tu berdê,

Axayê êlê de tu berdê, qayîşa maûzerê
Berevke, biavêje zendê,
De berî hezar hevsid mêrê hemîdyê de,
Derbaske gelîyê Panosê,
Derbaske ava Alîkendê.
De derbaske ava Alîkendê,
De bira bêbextê Romê
Seba talanê Dêrcemedê
Xulam û xizmetkaran neşîne cerdê...
Lo lo bavo, lo lo bavo.
Were lo bavo, lo bavo, lo bavo,
Bejna kekê Fetla zirave
Mînanî sipindara dev gelya,
Lo xweyo, bejna mîrê min zirave,
Mînanî sipindara dev gelya,
De dibê bihare, belekya berê xwe da çiya,
De bihare belekya berê xwe da serê çiya,
Cangîr axa kire gazî, go:
"Gelî koma xweyan û pismaman,
De rabin destên xwe bidine ser tetkên eynelûyan,
Hewara me tucar nayê,
Hewara me maye Xwedê jorê,
Dîsa Şemsê lo me Êzdîyane."
De tu berdê kekê Fetla, de tu berdê,
Axayê êlê de tu berdê, qayîşa maûzerê,
Berevke, biavêje zendê,
De berî hezar hevsid mêrê Hemîdyê de
De xwarke girê Panosê,
Derbaske ava Alîkendê.

Were lo bavo, lo bavo, lo bavo,
Lo bavo sibeye,dilê min kîne-kîne,
Lo xweyo sibeye,dilê min kîne-kîne,
De dibê hewarekê ketibû nava Romê.
Peya xwe peyê ra nagîhîne,
De peya xwe peyê ra nagîhîne,
Kamil Efendî kire gazî, go:
«Kuro, lawo, minê we ra digot,
Karê we bi talanê Êzdîya nîne,
De karê we bi talanê Êzdîya nîne,
De îro kubara sibê da,
Ser me da girtîye Cangîr axa,
Mîrê zirav, Xwedê zane ruhustîne."
De tu berdê kekê Fetla, de tu berdê,
Axayê êlê de tu berdê, qayîşa maûzerê
Berevke, biavêje zendê,
Berî hezar hevsid mêrên Hemîdyê de,
De xwarke gêdûka Panosê,
Derbaske ava Alîkendê.
Were lo bavo, lo bavo, lo bavo, lo bavo, lo bavo
Lo bavo meke, xweyo de tu meke,
De tu li serê Şemsê xweke,
Qasekê xwe di tetka maûzerê da egleke,
Hetanî koma pismaman,
Hersê elekê navtenga hespê veke,
Hersê elekê navtenga hespê veke
Te got, kuro, lawo em tev bavêjine alyê malê,
Gule barûtê fişeka lêkin,
Emê bajon pêşya bîmbaşyê Romê,

De bira careke dinê qesta talanê Êzdîya nekin.
De tu berdê kekê Fetla, de tu berdê,
Axayê êlê de tu berdê, qayîşa maûzerê
Berevke, bavêje zendê,
De berî hezar hevsid mêrê Hemîdiyê de,
De xwarke gêdûka Panosê,
Derbaske ava Alîkendê....
Ha hî, hî...

Perde

Şûna epîlogê

Dewsa nivîsara kêlma xelasiyê ji bo vê berhema xwe, min cîûwar kiriye beyta mêrxasiyê "Gundê Me". Beyt pêşkêş e jibo bîranîna Cangîr Axa, mêrxasên rex wî, wisa jî çil şêr û egîtên gundê Cercerîsê. Dema êrîşa Roma Reş ya sala 1918an li ser xelkên nehiya Baş - Aparanê, li nav wan da wisa jî gundiyên me, çil mêrên gundê me dibin cangorî. Wê demê Cangîr Axa li tev mêrxasên xwe tên hewar û gaziya cimeta Aparanê. Ewan pişta dijmin dişkênin, wan nemerdan radiqetînin û ji Ermenistanê derdixin.

Gundê me

(Beyta mêrxasiyê)

1. Sedsala bîstî

Sedsala bîstî, qirna sewdaser,
Li ser kederê de, te zêdekir keder.

Hey wek tajî, hey wek gurê har,
Te hem zulm anî, hem jî ulim, defter.

Qirna bîstî, tu ji me re buyî xem,
Xwîna me kişiya û bû rûbar, çem.

Dewra bê îtibar, qirna bê rehm,
Bo zulumakaran tu bûyî kerem.

Li werê kal û bavan xwîn dirijiya,

Xwîna diherikî, xwîn dipijiya.

Li ber zarîna zarokan erd dihejiya,
Li ser qezîyê de zêde dibû qezîya.

Hê ji dawiya sedsala nozdehan,
Dîn bibûn desthilatdarên osmaniyan.

Wan zulumkaran, wan bêwijdanan,
Însanên xerîb dabûn li ber firnikan.

Ewan bûn celat, ewan bûn ruhstîn,
Bo milyon û nîv xelkê ermenî.

Serhed ji êzîdiyan hat paqij kirin,
Şêxan û Şengal jî xwestin vala bikin.

Gundên me dûr bûn, dûrî zulmkaran,
Diwazdeh gund bûn li nehiya Aparanê.

Dor gundan bûn çiyayên ermeniyan,
Pişta gundan germ bu bi eskerên rûsan.

***

Rojek ji rojên biharan,
Bihara hezar nehsed hejdan.

Li gundên me de bû tarî, tarîstan
Bi derdê gundiyan de reş girêda ezman.

Bû guregura ewran, bû şîrqîniya birûskê,
Lê teîbetê nikarbû, pêşiya dijmin bigire.

Dijminî zalim bû, dijminî bi heytehol bû
Dijmin dixwest zorê ji xwedê jî bistîne.

Dijmin barêgeha xwe li ser çiyakî bilind,
Li ser gera jêra qotê Çîyayê Pampê danî.

***

Li binpiya çîyê, Gundê Pampê bû,
Pêşberî Pampê gundê Elegezê bû.

Beriya hemû gundan, derba herî giran
Ket li nav çavên xelkê herdu gundan.

Dest hatin firandin, serî hatin jêkirin,
Ketibû çîya û baniyan zêwîn û zarîn.

Derdê xelkê feqîr da digiriya ax, xwelî,
Xweliya ewilê biharê mabû bê çotkarî.

Ga li bestan mabûn bêxwayî, bêxwedan
Hêsir dibarîn, ji çavên hespên bê siwarî.

Zûkezûka sa bû, ewan ketibûn çolan,
Ewan badilhewa xwediyê xwe digeriyan.

Mî û berx li deştan mabûn bê şivan, berxvan
Bar'e bar'a wan diçû li ber perê ezmanan.

Du gundên êzîdiyan êdî bibûn wek goristan,
Qet tu însanekî zêndî herdu gundan da nemabûn.

Gujjîniya bayê bû, li navbera xaniyên nolî meyt,
Bayê jî pê gujjîniya xwe dihûnand ev beyt.

***

Eskerê Roma Reş êrîş bir li ser gundê me jî,
Wan xwest têkin heserê Cercerîsa rengîn jî.

Lê gund êdî xalî bû, tu kes tê de nemabû,
Haya gundiyan ji pêş de ji dijmin hebû.

Şêr û egîtên gund dest avêtibûn çekan,
Ketin pêşiya cimetê rûsipiyên malbetan.

Xelk di gelî û gebozên çiyê de hatin veşartin,
Mêr û jinan xendeq kolan, ketine sengeran.

Ser û guhên gundiyan dûrva li ser dijmin bû,
Dijminî fêlbaz bû, dijminî delkbaz bû.

Biçûk û mezinên gund zehf baş zanibûn,
Dijmin wê bixwaze wan bixapîne.

***

Dijmin, li gundê me de, dengê defê derxist
Li ber dengê defê erd û ezman dilerizîn.

Li ber dengê defê çiya û banî dilerizîn,
Li ber dengê defê xwîn li tamar de ditevizî.

Dengê zurnê jî li tev dengê defê bû,
Dijmin xwest bêje, def ne defa hewarê bû.

Dengê def û zurnê kete guhên gundiyan,
Aqilê dilsoz û bêaqilan ketibû çokên wan.

Bê hemdî wan ling li bin wan de direqisîn,

Çend kesên reqashez birbi gund bezîn.

Wan baweriya xwe ji dilrehmiya dijmin anî,
Lê na, mirinê wan dehf dide, mirinê wan tanî...

***

Xwîna sorgevez nolî xêliya sor,
Kete bendavê, av kete tayê.

Li ser hovîtiya dijminê devxwîn,
Av diweqiya, lê lê bû biteqiya.

Axîn, zarîn kete çiyê, çiya lerizî,
Bû heytehol, bû hewar û gazî.

Li pişt her zinarekî şêrek sekinî,
Çiya hem şa bû, hem jî kewgirî.

Esker dev ji gundê me berdan
Berbi barêgeha xwe vekişiyan.

Çil xortên gund, çil şêrên çîyan,
Li hev civiyan, şêwra xwe kirin.

Wan bo xwe rêber jî kifş kirin,
Bû rêber Casimê ji Mala Mîran.

***

Mêrê mêr gotî, tu car ew natrse ji mirinê
Gava doza mêraniyê ji wî tê kirinê.

Mêrê mêr gotî, tu car ew natrse ji mirinê,

Gava axa kalûbavan tê zeftkirinê.

Mêrê mêr gotî, tu car ew natrse ji mirinê,
Gava xîret û namûs tê pêpezkirinê.

Berxwedan e, xebata merê mêr gotî,
Mafê her kesî heye bo berxwedanê...

2. Berxwedan

Berxwedan, ew xebat e,
Berxwedan, ew jîyan e.

Berxwedan melhem e,
Melhema li ser birînan e.

Berxwedan, ew wesiyet e,
Berxwedan, ew temî ye.

Wesiyeta kal û bavan,
Temiya xweşmêran.

Berxwedan, ew parastin e,
Parastina axa kal û bavan..

Berxwedan, ew parastin e,
Parastina irf, adet û ziman.

Berxwedan, ew doz e
Doza bo emr, bo jîyanê.

Hema ji roja ji dayîk bûnê,
Berxwedan jî li tev Însên tê dinê.

***

Mêrxasên me haziraya xwe dîtibûn bo berxwedanê,
Mêrxasên me jibo jîyana bi rûmet ketibûn li ser rê.

Derûdor tarî, tarîstan bû, tarî bibû bar, barê giran,
Ezmanê reştarî qey bêjî hilşiyabû li ser milên wan.

Qet stêrkek çî ye, stêrkek jî nediçirisî li erşan,
Stêrk û hîv xwe avêtibûn li pişt perda ewran.

Çil xort newal newal, ewan hêdî hêdî diliviyan,
Gera serfêza qempa osmaniyan da sekinîn ewan.

Mêrxasên me li hembêza çîyan da mezin bibûn,
Ewan çavpişîkî bûn, zû hînê tariya şevê dibûn.

Lingan bi xwe wan li berbi barêgeha dijmin dibir,
Bo lingên wan nas bûn hemû rê û dirbên li wir.

Li bin lingên wan da, qey bêjî ax ji xwe dihesiya,
Ne bi dilê axê bû, ku lawên wê, şev dane li ser rê.

Xişexişa pelên daran bû, xuşîniya cew û çirikan,
Mêrxas tele tel çûn, ketin guhêra hespên dijminan.

Hesp xewixî bûn, wan bêhna xelkên nenas hildan,
Mêrxasan wan da pêşiya xwe, dane ber qamiçiyan.

Hespê silikîn, ji cî veciniqîn, ji guhêrê derketin,
Mêrxasan berê hespên bezo dane gelî û newalan.

Qey bêjî per ji hespan va şîn bibûn, ewan difirîn,
Ev ax ne axa wan bû, wan bazdida, lezgîn diçûn.

Xwediyên hespan heta hişiyar bûn, ji xwe hesiyan,
Li çîyayê nenas, li welatê xerîb, ewan peya man.

***

Çil tivingên mêrxasan hevra kuxiyan,
Barana gula barî li ser serê neyaran.

Hewar û hêwarze ket li qempa nemerdan.
Qey bêjî ordiya dewletê berê xwe da wan.

Esker tirsiyan herekî alîkî da direvîn,
Fermendarên wan jî mabûn bêhêvî.

Ber derba dudan qey bêjî erd lerizî,
Qîşteqîşta fermandaran bû, dikirin gazî.

Çîya li wan vedigerand qîşteqîşta wan,
Saw û sênc dikir dilê wan merivxuran.

Gava wan dît, guhêra hespan vala mabû
Gujîn ket serê wan, çokên wan sist bûn.

Sawşawê ketibûn, tewşomewşo bibûn,
Wê şevê li ku da herin, wan nizanbûn..

Ewan peya bûn, hespên wan tunebûn,
Dersdaran wan hînî wê yekê nekirbûn.

Çavên hinek eskeran rev û bezê bû,
Fermandaran dîtin û lapte dîn, har bûn,

Wan piştêva esker gulebaran dikirin,
Wan eskerên din çavtirsiyayi dikirin.

Esker bere bere li ser hisê xwe da hatin,
Wan çav dane fermandaran ketin sengeran.

Şerê mêrxasan û eskeran geş û gur' bû
Mêrxasên me çil bûn, lê esker pir bû.

Çil mêr nolî lehengan berxwedidan,
Şev bibû delîl, bo çil xweşmêran.

Şev jî ne bêdawî bû, sibe sefî dibû,
Şer jî çiqas diçû ewqas girantir dibû.

Mêrxasên me fêz ji dijmin standibûn,
Li pişt her zinarekî de mêrxasek hebû.

Li ser serê osmaniyan de gulebaran bû,
Çavên eskerê dijmin dîtina riya revê bû.

Pişta çend eskeran kete fermandaran
Ewan berê xwe dane gelî û kendalan

Agir alav kete pişta pîlên wan neyaran
Laş nolî keviran diketin li binê geliyan.

Fermandaran helan da eskerên din:
- Kî bireve ewan wê bêne gulekirin!

Şerê eskerê dijmin û mêrxasanên me bû,
Şerê manê nemanê berdewam dibû.

Gule barûtên mêrxasan xelas dibûn,
Lê mêrxasên me ne mêrê revê bûn.

Ji nişkê va girmîn û xurmîn kete çîyê,

Qey bêjî ji cî ê xwe rabû Çîyayê Pampê.

Qey bêjî vê carê ne ku şêr û egîtan,
Lê çîya berê xwe dabû wan neyaran.

Dîsa li ordiya dijmin de tevlihevî çêbû,
Dîsa qîşteqîşt, qareqara fermandaran bû.

Eskerê dijmin yek yê din dida ber gulan,
Eskerê dijmin diket li ber derba zinaran.

Lê delkbaz bûn fermandarên neyaran,
Wan dît ku nikarin li ser şêrên li çîyan.

Gotine esker, ku ewan bibin du bir'an,
Bidin kifşê, ku xwedêgiravî direviyan.

Fermandaran êdî tê derxistibûn, zanibûn,
Hebe nebe fîşeqên lawên çîyan xels bûn.

Esker û fermandar ketin gelî û kendalan,
Tele tel hilkişiyan jor, nolî rûvî û çeqelan.

Wan rûvî û çeqelan ketin li pişt zinaran,
Serfêza sengerên mêrxasan ewan teliyan.

Tav li pişt çîyayê Elegezê va derket,
Şems çav wê ecêba reş û giran ket.

Pişt ji mêrxasan standibûn xwîxwaran
Mêrxas dorpêç kiribûn wan neyaran.

Mêrxas ketibûn çema wan delkbazan,
Yan kuştin, yan jî hêsîrî bibû para wan.

EZIKI.COM

Hêsîrî qebûl nekirin wan xweşmêran
Bû teyroka guleyan li ser serên wan.

Çil şêr û egît, çil teyrên serê çîyan,
Ketibûn nav telikan rûvî û çeqelan.

Xelas bibûn fîşeqên wan mêrxasan,
Wan bersiv didan dijmin pê kaviran.

Mêrxasek, piştî yê din, dibû cangorî,
Stêrk pey havdu, ji erşaan dadiwarîn.

Yên sax mabûn gişk birîndar bibûn,
Birînên wan şêr, egîtan pir xeder bûn.

Mêrxasên birîndar teslîm nedibûn,
Heta yek jî sax bû, şer berdewan bû.

***

Dijminê devxwîn birîndarên dorpêç kirî girtin,
Zulumkaran çi ecêb nebêjî, netanîn serê wan ...

Çavên birîndaran dirêtin, dikirin destên wan
Poz û guhên wan jêdikirin, li tev xwe dibirin.

Diqelaştin goştê hêtan, hêtên birîndaran
Herdu destên wan jî dikirin hindurê birînan.

Xelasiyê serê wan jêkirin, avêtin binê geliyan
Agir li binê laşên miriyên bêserî mabûn dadan.

Ya wan hov û dirindan dikir tu kesî nekiribû
Gur û hirçên çîya û baniya ji wan çêtir bûn.

Berê da tê gotin: xwîn tu car li erdê nemîne,
Zûtirekê tola wan xweşmêran hate hildan.

***

Mêrxasek tik tenê, sax li vê dinê mabû,
Nolî dîna wî hatibû, ew sewdaserî bibû.

Gava, wî qise kir, çi hatibû serê wan,
Xelkê tilî kirin guhan, hêsir barîn bi ceman.

Mezinên gund civiyan, şêwra xwe kirin,
Wan zanibû, ku osmanî wek gurê har'in.

Hertim dilan da bû, kîn û rika êzîdiyan,
Dijmin xwe helal kiribûn.kuştina wan.

Ewan ji wir dernakevin, ewan naçin,
Heta derba giran ya mêrên çê nebînin.

Xortên gund çê bûn, lê hindik bûn,
Şer û cengan da ewan qal nebibûn.

Tenê yekî nolî Cangîr axa dikaribû,
Li tev şêr, egîtên xwe wan raqetînin.

Hewar, gaziya êzîdiyên navça Elegeze
Zûtirekê hat û kete guhê Cangîr Axa.

3. Heyfhildan

Cangîr axa, ji cî rabû,
Cangîr axa kafir Hirço siwar bû.

Şêr û egîtên Cangîr axa ji cî rabûn,
Şêr û egît kehêl û manekiyan siwar bûn.

Bû hole hole hola şêr û egîtan,
Bû hîrrîniya manekî û kehêlan.

Şêr û egîtên me ketine li ser rê.
Egîtan berê xwe dane Pampê.

Navê Cangîr axa û xweşmêran
Tim saw dikirin dilê neyaran.

Vê carê jî dijmin dît meşa şêran
Pirtepirt ket li cêrgên xwînxwaran.

Fermandar bazdan, fermandar revîn,
Eskerên wan li qada şer de man bêserî.

Eskerên bêserî hatin dorpêç kirin,
Yên teslîm bûn sax hatin hîştin.

***

Serê tu eskerekî jî nehate firandin
Tu kes saxesax nehate şewitandin,

Çavên qet tu kesî nehat derxistin,
Poz û guhên tu kesî nehat jêkirin.

Goştê hêtên tu kesî nehatin vekirin,
Destê tu kesî neket hindurê birînan.

Birîndarên wan hatin derman kirin,
Laşên kuştiyên wan hatin çalkirin.

Berê romiyan dane qempên hêsîran,
Bi derge dîwan, ceza wê bidana wan..

Fermandarên bazdabûn hatine girtin,
Ewan ji destê mêrxasên me nefilitîn.

***

Şêr û egîtên me û ermeniyan, dane dû wana,
Şêr û egîtên me û ermeniyan, dorpêç kirin wana,

Fermandarên zalim û xwînxar, nedihatin rayê,
Tirs ketibû li ser wan, diricifîn, ketibûn tayê.

Çeqeçeq ketibû li nav dev û diranên wan guran,
Destên wan dilerizîn, lê dev bernedidan ji çekan.

Mêrxasên mêşindar kuştin hemû fermandar.
Qempan da sax li dinê neman eskerên sûcdar.

.
Xwîn pê xwînê, helbet tu car nayê şûştin,
Lê mêrkuj, zû be yan dereng têne kuştin.

4. Roja îroyîn

.
Roja îroyîn, min daye li ser rê,
Min daye li ser rê, berbi te têm.

Berbi te têm, gundê kalbavan
Cercerîsa rengîn, hêlîna şêran.

Dijmin, dijminê hezar salan
Êrîş birin ser me gelek caran.

Cara dawîn, beriya sed salan,
Osmanî bû navê wan bêbavan.

Me tunekirin bû hedefa wan
Axa me zeftkirin bû nêta wan.

Wan kuştibûn xelk bi milîyonan
Xelkên aborîgên, yên ne ji wan.

Zeftkiribû cî û warê wan însanan
Wisa jî warê kalbavên êzîdiyan.

Hê jî ji xwînê têr nebibûn ewan
Hatibû gihîştibû nehiya Aparanê.

Êrîş birin li ser gundê me, ewan,
Çil şêrên me berê xwe dane wan.

Şêrên ciwan, şêrên serê çîyan,
Wek çîyakî bû, her yek ji wan,

Bo şênkirinê hatibûn dinê ewan,
Bo jîyanê ji dayîkan bibûn ewan.

Bo xîretê, ji mal derketibûn ewan,
Bo namûsê, ji mal derketibûn ewan.

Xwînxwar, bûn neyarên wan
Delkbaz bûn neyarên wan.

Mêrxasên me nolî şêran
Berxwedabûn pêşberî wan..

Wê neyê bîrkirin kirê wan mêrxasan.

Ewan wê dilê me da bin heta kurê kuran.

***

Şiverê, şiverêya berê, roja îroyîn bûye rê.
Riya fireh, darên sewlê li ser herdu milan.

Sewl piştrast û serbilindin nolî qerewilan,
Qey bêjî bi wî awayî min silav dikin ewan.

Lê li ku bibû deşta şer, beriya sed salan,
Niha bûye mêşeyê sawlan, bûye daristan.

Lê li ku bibûn cangorî çil şêr, şêrên çîyan,
Ew der hatiye xemilandin pê gul û sosinan.

Derûdor aram, li ser serê min ezmanê şîn,
Li erşê ezmîn ronahî dihûnîne tava narîn.

Xelas bû, çû qirna bîstî, sedsala sewdaser,
Me got: em ê hew zêde nebînin kul, keder.

5. Sedsala bîstûyekê

Qirna bîstûyekê, sedsala nûdem,
Me got: besî me bûn xiyal û xem.

Tê li tev xwe xêr û xweşiyê bînî,
Mereza nemard, xinizan bigihînî.

Tê sitar bikî hevtê û du miletê dinê
Û em jî bibin xwedî dewlet vê hênê

Hemû milet, hemû cimet û dîanet,

Wisa jî em, li ser dinê bijîn bêminet.

Nekeve guhê tu kesî navê fermanan
Ya dawîn be fermana hevtêûdudan.

Qirna bîstûyekê, sedsala nûdem,
Te jî li ser xeman da zêdekir xem.

Îhtibara te jî tune, rehma te me nedît,
Jibo zulumakaran tu jî bûyî kerem.

Li ser qezîyê da zêde dibe qezîya,
Li ser kederê da zêde dibe keder.

Hê jî hevt saliya te xitim nebibû,
Cimet teze ji dîktatorekî xelas bibû.

Necamêr û nezan dîn û har bûn,
Qey bêjî strû li ser serên wan şîn bûn,

Wan nemerdan, wan bêwijdanan,
Êzîdiyên Şêxanê dane li ber firnikan.

Paşê li bajarê Başikê nexweşî çêkirin,
Bîstûçar xortên êzîdiyan hatine kuştin.

Ewan bûn ruhstînên, wek xinizên berê,
Bo xelkên Gir Ezêr û Sîba Şêx Xidirê.

Wan neheqan, rojeke ji wê rojê reştir,
Bo êzîdiyên Qeza Şengalê, hazir kir.

***

Şevek ji şevên havînan,

Havîna du hezar çardan.

Kesên bêxwedê, bêîman,
DAÎŞ berî pêsîra me dan.

Nolî çeqalan, nolî rûviyan,
Nîvêşevê ketin malan ewan.

Dîsa welêt da bû qal û ceng
Dîsa dinê alem ma bêdeng.

Dîsa Şengal hat kavil kirin,
Kevir li ser kevir nehîştin.

Keç û bûkên me revandin,
Serê mêr û jinên me jêkirin.

Xwîn wek çirik dirijiya,
Xêwîn li ser axê dipijya.

Ber zarîna jinan û êtîman
Te yê bigota erd dihejiya.

***

Vê carê jî bi hezaran keç û lawan
Dest avêtine çekan û ketine çiyan.

Vê carê jî bi hezaran keç û lawan
Ketin li nav tevgerê û berxewdan.

Vê carê jî bi hezaran keç û lawan
Bo parstina axa xwe bûn canfîdan,

Tu egît, tu mêrxasek wê nayê bîrkirin,

Navên wan wê bê nivîsar pê herfê zêrîn.

Dijmin û xiniz jî gere rehet ranezên,
Xwedê li jor heye, ew her tiştî dibîne.

Ciyê wan cilreşan, ciyê wan dilreşan,
Wê tunebe ne li erdan, ne jî li erşan.

Em hebûne beriya şeş hezar salan,
Emê şên bikin hingeha kalûbavan

***

Em ê dîsa nolî şeş hezar sal berê,
Hevtê û du miletî ra bixwazin xêrê.

Em tu milet û dîanetê ra nakişînin kînê,
Em hatine dinê bo avakirinê, şênkirinê.

Şênkirina vê axê, vê topraxê, vê cîhanê,
Bavkuştiyê xwe ra jî em naxwazin mirinê.

Qencî û xêrxwestinê çêtir tune li vê dinê
Topraxa me westiyaye ji evd, însanên zinê.

Eger awa here, topraxa me wê welgere,
Topraxê welgere û her dişt wê roda here.

Ezîzê Gerdenzerî,
Kopenhagên, 2019.

Danasîn



Neferên mala Cangîr Axa.



Du mêrxasên cimetê, mêrxasê cimeta êzîdiyan Cangîr Axa û mêrxasê cimeta ermeniyan Andranîk Ozanyan. Herdukan pêşberî dagirkerê axa kal û bavan, pêşberî Roma Reş şer kirine.

Têatira Kurdî li Tbîlîsê
û
Şanoya Cangîr Axa(Zarîna Çîya)

" ... Tê gotin, ku van paşwextiyan têgihîştina xwenaskirinê wek qewmiyet li ba gelê me pêşketiya(gotin derheqa xelasiya salên 1980an û destpêka salên 1990an da ye). Me bawer dikir, ku temaşevanên têatroya me, bi dilûcan dixwestin xwe baş nas bikin. Û em hêviya şanoya xwe bûn, em rêke dirêj derbas bûn, heta me ew dît. Û ji nişkê va mecaleke wisa kete destê me, ronahî dît şanonameya nivîskarê ciwan ji Yêrêvanê Ezîzê Gerdenzerî "Zarîna Çîya". Hema piştî cara yekem xwendina vê berhemê, bi dest xwe da, xem û xeyalên me li tev rabûn. Şanoname derbarê rûpelekî dîrokî ya miletê me bû; rûpela tije xwîn - derheqa koçberiya beşekî milet ji Tirkiyê berbi Kavkazê bû. Koçberiya bi mecbûrî, koçberiya tirs û xofa tunebûnê, asimilasiya bûnê, li dilên xelkê me da.

Kakilê şanoyê - şexsiyeta Cangîr Axa ye, axa û rêberê çendik çend wan eşîran, yên koçberî Kavkazê bûn.

Hazirkirina şanoyê ne hêsan bû. Xebat salekî zêdetir berdewam bû. Gelek tişt dema hazirkirinê hatin guhastin. Guhdarîke mezin me dida li ser tikstê. Me dixwest, ku her gotinek bi zelal bikeve guhên temaşevanan. Şano, li ser bingeha dîalogên li navbera mêrxasên sereke, navbera Cangîr Axa, Rostemê gundî û Şêx da, hatiye çêkirin. Şêx li vir wek rêberekî dîanetê tê dîtin. Her kes ji wan mêrxasan dixwaze rastiya xwe îsbat bike. Xêncî pirsa sereke: Gelo çiqasî rast bû, dûrketina beşek ji beşên milet, ji axa kal û bavan? Li şanoyê da, wisa jî têma/babatên din yên giranbiha hene, kîjan cara yekem û

wan salên paşwextiyê, vekirî û bi wêrekî dihate gotin. Ew xeberdana derheqa êzîdiyan û êzdiyatiyê da bû, xeberdana derbarê şexsiyeta Cangîr Axa da bû û pir tiştên din yên aktûal.

Şano ji aliyê temaşevanan va hate fehmkirin û hate qebûlkirin. Em bi guman in, ku ev şano, wê emrdirêj be.

Lê têatir dîsa li nav lêgerînê da ye, dîsa hazir dibe, ku li tev temaşenvanên xwe xeberda. Û hilbet, em dîsa hêviya şanonameya hêja ne.

Tê kifşê, ku têatirê ew şanoname jî dît û vê carê, ew dîsa jî li bin qelema Ezîzê Gerdenzerî derketiye û navê wê jî Dim - Dim(Xanê Çengzêrîn) e...

Natela Abas

(Ji kitêba "Têatra Kurdî li Tbîlîsê". Kîjan hatiye çapkirin ji aliyê Merkeza Çanda Kurdî li Moskvê, sala 1990î. Çapxane MP "Inform-poligraf"

Şikilên li jêr jî ji kitêba jor gotî hatine hildan.

PS: Ev şano, bi navê "Cangîr Axa", salên 1990î hatiye pêşkêşî temaşevanan kirin. Her carê, gava ev şano dihat pêşkêş kirin, salonê da ciyên vala tunebûn. Milet ev şano û mêrxasê sereke Cangîr Axa pir hez kir.

Ezîzê Gerdenzerî, Cangîr Axa (Zarîna Çîya), drama du perdeyî.

Derhênar: Mirazê Ûzo.

Wênekêş: Têr - Mînasiyan.

Mûzîk: Şalîkoyê Miraz.

Lîstikvan: Besa Memed, Tîtalê Evdo, Msûrê Aram, Alîkê Şîraz, Şalîkoyê Miraz, Aramê Miraz, Şîrinê Emo Baravî, Bînbaşê Axê, Îsmaîlê Ûsiv, Casimê Wezîr.

EZDIKI.COM



Koma Têatira Kurdî ya li Tbîlîsê.



Derhênar û rêvebirê Têatira Kurdî ya li Tbîlîsê Mirazê Ûzo Cewarî.



Nûralyan Romanê Hraçîk, wênekêş.



Têr - Mînasyan Şamîrê Sûrên, wênekêş.



Şîrinê Emo Baravî, li şanoyê da dilqê Camgîr Axa dilîst.



Tîtalê E'vdo, li şanoyê da dilqê Rostem dilîst.



Besa Mamed E'cemova, li şanoyê da dilqê jina Rostem dilîst.



Aramê Miraz Belekerî, li şanoyê da dilqê Şêx Edo dilîst.



Bînbaşê Axê Cildergûşî, li şanoyê da dilqê dengbêjê Camgîr Axa dilîst.



Casimê Wezîr Osmanov, çêkîst, karmendê asayîşê.



Şalîkoyê Miraz Cangoyî, çêkîst, karmendê asayîşê.



Îsmaîlê Ûsiv Sardarov, çêkîst, karmendê asayîşê, eskerê tirkan.



Alîkê Şêraz Arabov, eskerê tirkan.

Çend dîmenên ji şanoya Cangîr Axa(Zarîna Çîya):



Rostem - Tîtalê Evdo, dengbêj - Bînbaşê Axê.



Cangîr Axa - Şîrinê Emo Baravî, Varo - Misûrê Qulîxan.



Jina Rostem - Besa Memed.



Şêx Edo - Aramê Miraz.



Dengbêjê Cangîr Axa - Bînbaşê Axê.



Vîdîo fîlma Şanoya Zarîna Çîya

Ezîzê Gerdenzerî
Cangîr Axa
Drama dîrokî

Ազիզե Գարդանզարի
Ջանգիր Աղա
Պատմական դրամա

Weşanxana Spica/ Սպիկա հրատարակչություն
Արշակունյաց 4, 503 սենյակ

Rêdaktor: Siabend Bakoyan
Korêktor: Rûstam Amîryan
Rêvebirê gişkî yê weşanxanê: Artak Avagjan
Rûpelsazî û dîzaiyna qalpax: Artak Avagjan

Խմբագիր՝ Սիաբանդ Բաքոյան
Սրբագրիչ՝ Ռուստամ Ամիրյան
Հրատարակչության տնօրեն՝ Արտակ Ավագյան
Կազմի և համակարգչային ձևավորումը՝ Արտակ Ավագյան

Երևան, Սպիկա Հրատարակչություն, 2019

Yêrêvan, Weşanxana Spica, 2019



Ezîzê Gerdenzerî

Ezîzê Gerdenzerî (Şalîko Amîryan) ronakbîr, helbestvan, nivîskar, dramanûs û wergêrekî navdar ji Ermenistanê û Danîmark e û di eynî wextî de jî doktorê zanîyarîyê ye. Ezîzê Gerdenzerî 28ê Cotmeha 1945'an li Tiblîsê, li Gurcîstanê, li malbeta êzîdiyên peneber de ji dayîkê bûye. Di sala 1948'an de malbata wî vedigere Ermenîstanê. Zaroktî û xortanîya nivîskar li gundê êzîdiyan, Dêrikê (berê Cercerîs), navça Aragasotnê, derbas dibe.

Di sala 1970'an de ew Zankoya Bijîşkîyê a Yêrêvanê xelas dike. Di salên 1970-1981 li Çîmkendê, li Qazaxistanê û di salên 1981-2002'an de jî di Yêrêvanê de wek xîrûrg kar dikê.

Ew di salên 1960'an de dest bi karê afirandarîyê dike. Di sala 1989'an de şanonameya "Zarîna Çîya" wek pirtûk li Yêrêvanê tê çap kirin. Di sala 1990'î de romana nivîskar "Fîncana Ferfûrî" li Ermenistanê tê çap kirin. Di sala 1996'an de berhevoka "Gêlavêj" li Yêrêvanê çap dibe. Di sala 2011'an de berhevoka nivîskar "Hezkirina Qedexe" û pirtûka berhemên H.C. Andersen "Çîrok û Serpêhatî", ku ji alîyê Ezîzê Gerdenzerî ve tê wergrandinê, li Istanbolê çap dibin. Di sala 2015'an de jî weşanxaneya lîsê a Amedê dest bi çapkirina hemû berhemên Ezîzê Gerdenzerî dike û 2 kitêb êdî hatine çap kirinê: "Fîncana Ferfûrî"(roman) û Ludvig Holberg "Jeppeyê li serê çîyê"(şanoname), ji danîmarkî: Ezîzê Gerdenzerî. Sala 2018'an li Ermenistanê de 2 pirtûkên nivîskarên danîmark jî, ku ji alîyê Ezîzê Gerdenzerî ve hatibûn wergrandinê tên çap kirinê: H. C. Andersen "Periya avê û çîrokên din", Kaare Bluitgen "Karen Jeppe. Ronahî li nav tariya sawkêş de - Berxwedana mileţekî". Li Yêrêvanê, sala 2018'an wisa jî du romanên nivîskar "Çîyayê Şengalê", "Bingeh" û kurteromana "Sûrên û Bîco", têne weşandinê. Destpêka sala 2019an dîwana helbestan ya bi navê "Şengala Birîndar" li Yêrêvanê tê çap kirin.

Nivîskar lauriatê xelata lîteratûrê e (Danîmark, Wezîreta Çandê, 2012).

Berhemên nivîskar bi pir zimanan hatine wergerandinê û weşandinê.

Dr. Ezîzê Gerdenzerî di sala 1997'an de dibê endamê Yekîtîya Nivîskarên Ermenistanê û di sala 2005'an de jî dibê endamê Yekîtîya Nivîskarên Danîmark.